



Zanîngeha Wan Yûzûncû Yîlê

Enstîtuya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

URF Û ‘EDETÊN HERÊMA AGIRİYÊ

Amadekar

Hakan ÇİFTÇİ

WAN – 2018



Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

AĞRI VE ÇEVRESİNDEKİ GELENEK VE GÖRENEKLER

Hazırlayan

Hakan ÇİFTÇİ

Danışman

Dr. Öğr. Üy. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2018

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
PÊŞGOTIN	VI
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK	1
1.URF û ‘EDETÊN HERÊMA AGIRIYÊ	5
1.1.YÊN JÎBÎRKIRÎ	5
1.1.1. Dan Kutan.....	8
1.1.2. Cil û Berg.....	9
1.1.3. Reşgirêdan (Şîngirtin).....	11
1.1.4. Zewac û Dawet.....	13
1.1.5. Libûdîtî (Kulav Çêkirin).....	18
1.1.6. Kosegelî.....	19
1.1.7. Beşîkertme û Berdelî.....	20
1.1.8. Beranberdan û Sedîpez.....	21
1.1.9. Koçkirin (Koçbêrî).....	23
1.1.10.Xwarin û Vexwarin.....	25
1.1.11.Cinaqşikandin(Merc Girtin).....	30
1.1.12.Çerçîti.....	30
1.1.13. Paletî.....	32
1.1.14. Porkurî.....	34
1.2.YÊN NÛJENBÛYÎ	35
1.2.1. Sinet û Kirîvatî (Sunneta Nebî).....	35
1.2.2. Serxweşî.....	36
1.2.3. Deng û Dengbêjî.....	36
1.2.4. Mêzhebê Kurda.....	38
1.2.5. Eşîr û Paşnav.....	39
1.2.6. Meşq û Dew Kêlandin.....	40
1.2.7. Mêvandarî û Dîwanxane.....	41
1.2.8. Ardû û Zivistan.....	42
3. HÎN AMÛRÊN BERÊ DAHATÎN BÎKARANÎN	45
4. ENCAM	48
5. ÇAVKANÎ	52
5.1. Çavkaniyên Nivîskî.....	52
5.2. Çavkaniyên Devkî (Rûbirû).....	55
5.3. Çavkaniyên Malperî.....	56
5.FERHENGA KURDÎ -TURKÎ	57

KURTE

Folklor (edebiyata devkî) beşeka giring ya çanda gelan e. Eger meriv ser naveroka foklora kurdîbisekine gelek babet û mijarên curbicur yên folklorî berçavên me dikevin. Ev babet û mijar cihê şanazî û vekolîn û şîrowekirina akademî ne.

Jiber vê pêdiviyê, sedan û hezaran vekolînê zanistî liser xebat kirine ku gencîna kelepura gelê me tijîtir bibe. Beşeka mezin ya foklora kurdî jî ya herêma Serhedê ye. Îro ev çand û kelepur kurdî hinek babetanda xwe diparêze hinek babetanda winda bûye hinek babetandan jî xwe tarzekî nûjen kiriye.

Me hewl da ku li ser urf û ‘edetên kurda bi taybeti yên herêma Serhedê da bajara Agriye û derdorên wê bixebitin. Li Agirî û li derdorê wê adet û kevneşopên me, yên ku hatine windakirin anjî ku hatine jibîrkirin kîjanin û faktorên ku domandina wan kevneşopan bandor dikin çine, emê bi wan bi mînakên kevneşopên folklorîk ve raxin ber çawa. Ji boy ku hin kevneşopên çanda Kurdan bigihînin neslên ciwan û akademiya rojanê. Me qirarê xwe digel mamostên rê nîşander li ser vê mijarê da.

Bi nivîs û wêneya ve ji ber bondora faktorên jev cûdatir, kevneşopên me yên ku êdî zêdenayên xuya kîjanin, emê xebata xwe li ser vê mijarê biqedînin.

Di edebiyata Kurdî ya Gelêrî da, beşek ji folklorê urf û ‘edetên gel in. Dema ku meriv bixwaze fikir û ramanên xwe sedî sed bigihîne neslekî an jî miletekî din, gelek caran hewcehiyê bi urf û ‘edetên dibînin.

Armanca yekemîn ew e, ku ev xebat bibe mînak û gelek kes hêjayiyên folklorîk dema ku berhev bikin û biweşînin da ku berhevkarên ku bixwazin kitêb û ferhenga urf û ‘edetên çap bikin, ji van berhevkirinan wek çavkanî sûdê jê werbigirin. Mabesta duyemîn ew e, ku bal kişandina ser curbicur peyvên ku nav hevokan da derbas dibin. Û bêjin, destpêk û kurahiya ziman û wêjeya Kurdî diherike hezaran sal a.

Gelek kes pir cihan di’ a, nifir, biwêj, gotinê berê, dijûn, çîrok, şîret, çîrok, destan, stran, zûgotinok, serborî, tiştonek û metelok hwd. berhev dikin. Ji ber vê cûdahiya di navbera herêman da, di berhemên folklorîk da jî xwe nîşan dike. Ger orjînalîteya wan xera bibe, pispor

dê çawa bikaribin, cûdahiyên di navbera herêman da fêrbin. Bal hat kişandina ser derxistina meydanê ya yekîtî û dewlemendiya zimanê Kurdî.

Piştî çend xalên destpêkê vê xebatê da urf û 'edetên ji gelek kesan rûbirû hat pirsîne. Yên ku di hiş da bûn û yên ku kovar û kitêban da hatine çapkirin û hinek jî yên ser malperan hatine weşandin, xebatê da kombûn. Di vê xebatê da, me bi tenê urf û 'edetên li gor yên winda bûyî û yên nûjen bûyî nivîsîn, wate û şiroveya wan ya berfireh nenivîsîn. Ew mijara xebateke û lêkolîneka din e.

Dawîyê da ev xebata li gorî rê, rêbaz û reçikên zanistî amade bûye edîb, şaîr, zimanzan, rewşenbîr, lêkolîner, hunermend û hemû kesên ku bi ziman, wêje, çand, dîrok, pezişk û civaknasiya kurdan ra têkildar in ra bi dilşadî û bextewarî pêşkeş dibe wek çavkaniyekê akademik a bingehin.

Peyvên Sereke: Urf, 'Edet, Folklor, Edebiyata Gelêrî, Herêma Agiriyê.

ÖZET

KÜRT HALK EDEBİYATINDA AĞRI YÖRESİ ÖRF VE ADETLER

Kürt Halk Edebiyatındaki folklorik türlerden biride örf ve adetler konusudur. İnsan bazen geçmişine ulaştırmak istediği vakit bu örf ve adetlere ihtiyaç duyar. Bu durumda ancak örf ve adetlerkişiyi geçmişene götürür ve kendisini tanımak için akıl ve gönlünden geçeni tam olarak anlatır ve kişiyi bilgilendirir. Kimi zaman örf ve adetler tanınmazsa kişi kendisini ve kökünü tam bilemez ve yeniliklere açık olamaz.

İlimiz Ağrı ve çevresindeki yerlerde zaman içinde kaybolan veya unutulmuş geleneklerimizin neler olduğunu ve bu geleneklerimizin yaşatılmasını engelleyen faktörlerin neler olduğu ile ilgili bir tez çalışması yapılması ve bunu bazı folklorik geleneklerle örneklendirilmesi gereklidir. Kürt kültüründen seçilmiş çeşitli geleneklerin gelecek kuşaklara aktarılması için bu küçük çalışma araştırılmaya karar verildi.

Çalışmada çeşitli faktörlerin etkisiyle artık pek görülmeyen gelenekler görsellerle desteklenerek çeşitli örneklerin sunulması planlanmaktadır.

Bu çalışmayı hazırlama maksatlarından biri şudur ki halk edebiyatında akademik olarak, folklorik eserler hazırlayan ve özellikle de örf ve adetler alanında sinema, tiyatro, film, makale, sözlük, dergi ve kitap çalışması yapanlar, çalışma ve eserlerinde bir kaynak olarak istifade etsinler.

İkinci amac halk arasında unutulmuş birçok örf ve adet içinde geçen birçok eski ve anlamlı uygulama göz önüne getirildi. Kürt dili ve edebiyatının derinliği ve mazisi yüz yıllara kadar akıp gittiği görüldü. Bir diğer amac ise araştırmacı ve yazarlar değişik Kürt bölgelerinde atasözü, bilmece, bulmaca, deyim, şarkı, hikâye ile beraber dua, beddua ve küfür sözlerini topluyor ve örf adetler üzerinde çalışma yapıyorlar. Böylece coğrafi bölgeler arası zengin dil ve kültür farklılıkları ortaya çıkmış oluyor. Bu çalışma ile Ağrı yöresindeki örf ve adetlerin zenginliği ve bölgeler arası farklılıkların tanınmasının yanında kültür birliğinin oluşması ve varlığında akademik olduğu uzmanların dikkatine sunuldu.

Birkaç başlangıç noktasından sonra bu çalışma çoğunlukla insanlarla yüz yüze görüşülerek ancak bir kısımda makale, dergi ve kitaplarda yazılanlarla birlikte çeşitli youtube, facebook ve internet sayfalarından istifade edilerek yazıldı.

Her ne kadar çalıştığımız bölge “Ağrı ve çevresi” olsa da; bu durum çalışmamızın sadece bu bölgede tamamlandığı anlamına gelmemektedir. Çalışma Ağrı ili ve Serhadbölgesinin diğer illeri örf adetleri ile bunlara benzerlik gösteren bütün Kürt örf ve adetleri dikkate alınarak yazıldı.Çalışma unutulmuş ve değişime uğrayan gelenekler olarak tasnif edildi.

Bu çalışma sonuçta Kürt dili, edebiyatı, tarihi, kültürü,sanat, tip ve sosyolojisi ile ilgili akademik çalışan bütün araştırmacı, dilbilimci, edebiyatçı, şair, sosyolog ve sanatçılara temel bir kaynak gibi takdim edildi.

Anahtar Kelimeler:Örf,Adet, Folklor, Halk Edebiyatı, Ağrı bölgesi.



ABSTRACT

PRAYS AND CURSES IN KURDISH FOLK LITERATURE

One of the folkloric sections in Kurdish folk literature are prays and curses. Sometimes, when people want to convey their wishes and aims to someone fully they need them. In such cases, only prays and curses explain fully what goes through in the person's heart. In these situations, if prays and curses are not done, the purpose is incomplete.

One of our aims to prepare this study is that people preparing precious works in folk literature and especially those preparing books and dictionaries in the field of words of prays and hate benefit from their works as a source. Our second goal is that by considering some radical and old Word in the sentences of prays and hate used among people, we can say that the roats and depths of Kurdish language and literature date back to countries.

Our another goal is that researches collect prays hate phrases, idioms, proverbs, swearword, riddles, puzzles in different regions. So this leads to language and cultural differences among geographical regions. With this study, the experts recognizing the differences and the unith and richness or Kurdish language are taken to attention.

After several points of debut much of the endeavor we wrote down prays and hate phrases lay interweaving with people face to face on the other hand the rest of this endeavour we utilite it from the boks, magazines and web sites. No matter where the place we live in is "Serhad" it doesn't mean that it was completed only here. Our endeavour was gathered and written down from the regions of Serhad, Amed, Hakkâri, Botan, Behdinan, Soran, Şehrezor, Mahabad, Dersim, Kafkasya and Rojava. This study was assorted in respect of issues and regions, but not by alphabetical order. Nevertheless purview and comments were left for another study. Ultimately we present this study to all academical researchers work as linguists, litterateurs, poets and artists as a basic resource to who Works on Kurdish language, literature, culture, history and sociology.

Key Words:Pray, Hate (Curse), Folklor,Classical Kurdish Literatuare,Ağrızon.

PÊŞGOTIN

Di vê xebata ser edebiyata Kurdî de li ser ferhengnasiya têgehên urf û 'edetan hat rawestandî û di nav gel de çawa tê bikaranîn û belav bûna pênaseyên wan hat dayîn. Têkiliya ferhenga urf û e'edetan, çavkaniyên urf û e'edetan, 'emilandina wan a rojane û li gor herêmên cuda cuda kîjan urf û e'edetan hene têkilî bi Edebiyata Kurdî re hat diyarkirin. Keresteyên vê xebatê ji 'emilandina rojane ya axivkerên zimanê Kurdî bi diyalêkta Kurmanciya jorîn û Kurmanciya Serhedê ve hatin wergirtin.

Kesên li ser urf û e'edetan xebitîne hatin diyarkirin. Derbarê dabeşkirina urf û e'edetan da agahî hatin dayîn. Mînakên Herêmên curbicur hatin beraw kirin û nîqaş kirin. Pênaseyên urf û e'edetan ên heyî hat dayîn û li gor agahiyên deveran hat pênasekirin û binbeş kirin. Ciyê urf û e'edetan di nav hêmanên Edebiyata Kurdî de hat nîqaşkirin û diyarkirin. Derbarê xebat û tomarkirin û dabeşkirina li ser urf û e'edetan ên li hinek deverên Agiriyê da agahî hat dayîn.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Beşa yekemîn despêkê da terma urf û e'edetan warê ferhengê û erdnasiyê ve tê kîjan wateyê cureyên urf û e'edetan nav xelkê Kurda çawa tê bikaranîn. Beşa duyemîn derbarê mînakên urf û e'edetan Kurdan yê herêmê Agirî yê ji bîrkirîne. Beşa sêyemîn jî taybetî (xasma) urf û e'edetan deverê Agiriyê yê nûjen bûyinê. Dawiya her beşê da ew urf û e'edetên nakevine bin tu polan hat rêz kirîne digel encam û ferhengok û lîsta çavkaniya hat amadekirinê.

Lê mixabin li gor agahiyên me yê îro em hêj rastî xebateka rêkûpêk û ji bilî kêmîr tu çavkaniyên niviskî nehatin. Di vê xebata pîraliya di nav gel da zêdetir jêderkên me yê devkî bun. Dem dem rûbirû dem dem jî bi alîkariya çapemeniyê û medya ya civakî me agahî bi destxistin. Agahiyên herî zêde ji herêma Agiriyêda hat bi destxistin. Di nav herêma Serhedê da jî deverên notula Wan, Muş, Bilîs, Qers, Îdir, Erzirom, Erdexan, Maku, Xoy, Aran (Qerebax), Elegez, Agirî û derdorêçiyayê araratê û navçe û gundên giredayî bajara Agirêhemû ew bajarê Serhedê urf û e'edetên wan mina hev dişibîne hevûdu. Ev xebat digel kal, pîr, rûspî, axa, mezin, zana, rewşenbîr, helbestvan, seyda, şêx, mela bi taybetî jî rasterast di nav gel xwe da bi alîkariya malbatên niştecih û 'eşîrên qedîmî ve me ev urf û e'edet zêdetir rûbirû tomarkirin.

Ji ber astengî û bêçaretîyê me hewl da ku ev çand û kelepura dewlemed a derheqê urf û ‘edetên Kurda da bi alîkariya gel û mamosteyên xwe yê hêja ve em xebateke akademîk û zanistî ji bo nifşên me yê pêşerojê ra gencîneyekê berfireh amade bikin. Ev gencîne bira nav kitêbên kitêbxaneya Kurdistanê de cihê xwe yê qedirbilind û giranbaha bigre.

Bêguman amadekirina xebateka wiha êsan nebû, lewra li ber destê me tu xebatên bi pergaleka nivîskî tune bûn. Ji ber vê jî danîna çarçoveya vê xebatê û gihîştina encamên rast û durist gelek dijwar bû. Her wiha di amadekirina vê tezê de alîkirin û esankariyên mamosteyê min ê hêja Alîkarê Doç. Dr. Nesim Sönmez û arîkariya dost û hevalên min ên hêja û seydayên min cihê rêzê ne. Ji ber vê yekê ez di serî de spasiya mamosteyê xwe yê rênîşander birêz Nesîm Beg dikim.

Ji ber dewlemendî kirina teza min, pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng û rexneyên xwe yê di cih de ez malavahî li ‘eşîr û malbatên gelê xwe dikim. Eger pêşniyazên wan nebûna bi rastî jî ev xebata kêmbimaya û negihîştî armanca xwe. Loma jî ez deyndarê vê dostaniya gelê xwe yê dilsozane me. Ji bo vê xebata dilnizim spasî û rêzên xwe pêşkeşî hemû arîkar û piştgirên xwe û malbata xwe dikim.

Hakan ÇİFTÇİ

WAN -2018

KURTEBÊJE

amd. : Amadekar

B. : Beş

b.n. : berhema navborî

b.z. : berî zayînê

Bnr. : Binêre

BOA : Başbakanlık Osmanlı Arşivi (Arşîva osmanî ya Serokwezîrtiyê)

c. :cild

ç. : Çap

H. : Teqwîma Hîcrî

h.b. : heman berhem

H.r. : Heman rûpel

H.X : Hejmara Xwemîrî

hwd. : Her wekî din

j. : Jimar

K.T. : Komara Tirkiyeyê

M. : Teqwîma Mîladî

nd. : Nivîskarên din

p.z. : piştî zayînê

r. : Rûper an rûpel

R. : Teqwîma Rûmî

r.a : Rehma Xwedê Lê be

R: : Ragihandin

s.x.l : Silava Xwedê Lê be

t.ç. : teza çapnebûyî

vgz. : veguhêzer

wer. : Werger

weş. : Weşanger/Weşanxane



DESTPÊK

Herêm bi herêm kevneşopiyên ji hev cuda diafirin. Bi wê re bi heman rengî mirov dikare bêje, gelek xelk hatine û çûna bi demê ra di dîrokê da. Her xelkê ku hatiya û çûya; ziman, kevneşopî, çanda, ufr û ‘edetên wan jî li gorî jîyan û jîyandina wan bûye...

Ev teza kû li ser xebat tê kirin li ser civaknasiyê urf û adetên kû hatinê bîrkirinê û yê nûjen bûyine. Hinek çand û kevneşopên kurdan yê ku di nav gel da mina dankutan, teşî reşî, meşk kelandin, tevn çekirin, libûditî (kulav çekirin), delak û kirîvatî, kosegelî, beşikertme, berdelî, hedî hedî ber bi windabune diçin. Hinek ‘edetên mina zewac, qiz xwestin, dewat, kirivatî, dayin –standin, xebata paletiyê, kêlindî û das keşandin, cil û berg, listikên zaroka, cîrantî û ‘eşîrtî, mezhep û bawerî û hwd. ji jî ber derfetên rojan an tê nûjen bûyî an jî an jî bê tesir dibin. Ew mînakên ku me li jor raxiste ber çave, di jiyana civakan da çandeke hevpar ava dike. Hemu civak gor wê hevpariyê jiyana xwe didomîne.

Bi awakî akademîk û zanistî, jiyanamê da guherina çandî an jî urf û ‘edetên hatine windakirin û yê nûjen bûyî çine, nav civakê da çawa tesira wan çîye, ev urf û ‘edet yê wan raxin ber çevan. Sed mixabin ku ta roja îro me ew zargotina xwe, wek ku pêdiviyê nedaye hev, me ew urf û ‘edetên xwe yê Kurmancî ku temenê wan hezarê sala ye di ser guhên xwe re avêtîye..! Ew zargotin, urf û ‘edet çilo û çawa bin, pêmayên me ne, kesayetiya me, şaristaniya me di wan de belû û diyar dibe û dawî eynika pêşketina civaka me ne.

Çanda miletê Kurd ji wek miletê rojhilata navin û gelen din yê cihanê kevnarê û berfirehe. Çimki milete Kurd di vê coğrafîyayê hezaran salin dijîn. Ji ber vê demên duve dirêjin keleşor û kultira Kurda ji zedê berfireh û kurê. Pewiste kû despêke da li ser ferhengsazî û peyvsaziya urf û ‘edetên bê sekinandin. Urf û ‘edet kevneşopiyên gelin ku yê kevnarenin.

Kevneşopiyên wek qanûnî nînin ku gel bi dilxwazî keyfxweşî dikin¹ û bi cih tînin ku bi gerêdayî rê û rêbazan nînin wek adet, destûr, rê, rêçik û rêbazên bêzagon.² Rê, rêçik û rêbazên bêzagon³ ku aqil û ol dipêşînin û qebl dikin.⁴ Xweşdiviyên Civakê⁵.

¹Gümüş, Nezir – Karademir, Fevzî – İlhan, Ziver, *Ferhenga Kurdî- Tirkî*, Weşanên Türk Dil Kurumu, Enqere 2014.

²Gümüş, Nezir – Karademir, Fevzî – İlhan, Ziver, *Ferhenga Kurdî- Tirkî*, Weşanên Türk Dil Kurumu, Enqere 2014.

³Aydın, Fatih, *Ji Wikîferhengê Ferhenga Kurdî – Kurdî*, Çapa Elektronik, 2016.

⁴<https://www.dersimiz.com/terimler-sozlugu/Orf-Nedir-11874.html>

⁵<https://www.seslisozluk.net/>

Rê û rêbazên civakan bi gelemperî ku berê da yên nav xwe da dihevindan ku terz, urf, xweşdivî, desturê û quralên exlaqî ku dilxwazî û keyfxweşî⁶ bi aram di'emilandin û bi kar dihanîn.⁷ Tore yên ku berê da nav civakê da hene⁸, destur û quralên exlaqî.⁹

Kevneşop yektiya hemû mîratên civakî ne. Bi alîkî ve jî kevneşop hemû cureyên jiyana civakê ye. Civak van mîratan jê pêşiyê xwe digire û neqlê neslên bê dike. Lê belê dema ku neql tê kirin ev kevneşopan duguherin an jî tî jibîrkirin.

Di jiyane da kevneşop, bi demê ra diafirê û dibe. Jiyan mirov ya demên berê bigre heta roja me ya îro dibê kevneşop. Mirov dikarê wê, weke kevneşopiye bi navkê. Kevneşopî, di temenê wê da hizir, aqil, exlaq û hwd heye. Bi taybetî, mirov dikarê bêje ku kevneşopî, xal, zagon û destûrên civatiyê bi xwe ra diafirêne. Wê mirov, çawa bijî, wê civak, xwediyê nêzîkatiyên çawa bê, wê cihê mirov di civatê da çawa bê, berpirsiyariyên mirov çine, civaka ku mirov di nav da ya û an jî jê ya û hwd, hemû xal bi xal di nav kevneşopan da tî kifşîkin.

Di jiyane da, ku jiyane li gor xalna zagonî dide bi rê ve birin a Kevneşopî, hertimî bûya xaleke taybet di demê de. Di roja me de jî, bahse "Modernîte" yê tî kirin. Modernîte bixwe jî, jî gelek aliyan ve kevneşopan bi nerîna xwe ya ku bi awayê wê re lê dinerê re dike temenê xwe da. Exlaq, destûr û nêzîkatiyên civakê bi kevneşopan ra diafirin û li ser lingan in.

Di çanda civakan da, kevneşopî bixwe xwe nayên guhurîn yan jî nayên jibîrkirin. Faktorên ku wana diguhurînin hene. Ew faktor bi kurtahî em dikarin wiharêz bikin.

Faktorên Kû Kevneşop û Çanda Kurdan Bandor Dikin

- Modernîte

-Rewşa erdnigariyê

-Çalakiyên aborî wek ziraet û ajaldariyê

-Ol û bawerî

⁶Zana Farqîni, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2004.

⁷Aydın, Fatih, *Ji Wikîferhengê Ferhenga Kurdî – Kurdî*, Çapa Elektronik, 2016.

⁸<https://www.nedir.com/adet>

⁹<https://www.mumsema.org/ne-nedir/250862-adet-nedir-sozluk-anlami.html>

-Teknolojî û fen

-Teybetiyên îqlim û ruberka riwekî

-Koç kirin

- Awayên jiyanê

-Ziman...

Meriv van mînaka dikare zedetir bike. Lê bi teybetî modernîte, koçkirin, teknolojî, aborî û baweriyên olî (dînî) guhurendin û jibîrkirina kevneşop û çanda kurdan da cihekî girîng digirin. Ev faktorên ku me li jor nivîsîn bune sebebê windabuna hinek kevneşopan û guherandina hinekên din. Emê li wir wan kevneşopan bin banê winda buyî û moderin buyî dabeşbikin. Ev urf û ‘edet yên jibîrkirî û yên nebîrkirî (nûjen bûyî) dibin du beş.

Kevneşopiyên herêma Agiriyê û derdora we bin banê du beşan da tînan nasandin. Ew beş yek urf û ‘edetên bajara Agiriyê yên winda bûyîne a din ji urf û ‘edetên bajara Agiriyê yên nûjen bûyîne.

Erdnigariyan vê xebate gelemperi hemû coğrafyaya kurd lê dijîne. Lewra bila qeyd û merc seranserî welatê kurdan urf û ‘edet dişibin hev. Feqet ji bo ve tezê erdnigariya hemû kurdistanê nehate hîlbijartine xebata me herêmiye ku ji ber ku bi hurgulî bê xebatine.

Kurdistan mîratgirê şarezayiyên mezin e. Hurrî, Gotî, Med, Urartû (Haldî), Sasanî, Rom, Seddadî, Merwanî, Eyyubî, Rawêndî û gelek bandora xwe hîştine¹⁰. Mezopotamya ku parek axa Kurdistanê jî dikevê, wekî landîka, dergûşîya mirovahiyê tê zanîn. Cara pêşîn li vir ajal hatine kedîkirin, mirovahî fêrî bikaranîna alavên jiyanê hêsantir dikin û cotyariyê bûne.

Feqet ev xebata me her çiqas li ser urf û ‘edetên bajara Agiriyê û derdorên vê jî bûn; Lê mixabin Agirî ji parçekî herêma Serhedêye. Pêwîste kû em li vê derê qala welatê Serhedê bikin kû mijar bira wek akademîk be nasandin.

Di nav Serhedê da jî bajara Agiriyê û navçeyên wê Bazîd, Gîhadîn, Avakevir, Zêtkan, Xemûr, Panos û Dûtax û gundewarên wan hat xebatin. Da kû sînorên tezê diyarbin kû hurguliyên urf û edetên mîletê Kurd bînan nasîn.

¹⁰M. EMÎN ZEKÎ BEG, *Dîroka Kurd û Kurdistanê* (Wer: Ziya Avcî), Weşanên Avestayê, Stenbol 2012

Em li vê derê dixwazin coxrafya lêkolînê bi navên nû digel navên kevnarê bidin nasin.
Bajara Agiriyê û navçên wê wek kevnarê û nûjen wiha tên rêzkirin.

Agirî, Qerekose (Ararat) :Ağrı

Panos: Patnos

Giyadîn: Diyadin

Hewaran (Xemûr) : Hamur

Dutax:Tutak

Zêdkan: Eleşkirt

Avakevir: Taşlıçay

Bazîd, Beyazît, Bayîz:Doğubeyazıthwd.¹¹

Û navên gundên navendê û bajarokan jî bi awayî fermî hatine guhertin lê belê nav gel da xuyadike kû navên wan yên kevnarê bi awayekî 'esa nayên windakirin û birkin.

Îro çavkaniyên niviskî yên derheqê urf û 'edetên milletê Kurd hatiye nivisandin belkû kêmin an qedexenê ne berdestin. Wekû mirow bixwaze çen heba rêzke yeke wan a sereke û rekûpêk kiteba *Mela Mehmûdê Bazîdî* a bi navê "*Adat û Rusûtnameê Tewafiyê Ekradiye*" ye. Le pêwiste ku li wî ra li ser niviskar Mele Mehmûdê Bazîdî û kitêba wiya giranbiha a bi navê "*Adat û Rusûtnameê Tewafiyê Ekradiye*" agahî bînin dayin.

Zanyarê kurd û xebatkarê civakê yê bi nav û deng Mela Mehmûd Bayazîdî sala 1797-a li bajarê Bazîdê (Bayazîd) ji diya xwe bûye. Xortanîyê da ewî Quran xwendîye, di nav edebîyata bi zimanên kurdî, erebî, farisî û tirkî da kûr bûye û zimanên wan bê qisûr zanibûye.

Di vê xebatê de bi giştî li ser Mela Mehmûdê Bazîdî, berhemên wî, hevkarîya wî ya ligel Kurdolog August Jaba û bi taybetî jî 'Adat û Rusûmatnameê Tewafiyê Ekradiyeyê hatiye sekinîn û hemû nusxeyên wê kitêbê hatine muqeyesekirin. Bazîdî ev berhema xwe di navbera salên 1858-1859an de nivîsiye, bi vê berheme û yên din wekî damezrînerê pexşana Kurdî tê qebûlkirin.

Adat û Rusûmatname, hem ji ber mijara xwe ve ku 'edet, bawerî, xûy, kevneşopî, xwarin, vexwarin, rabûn û rûniştin bi kurtasî hemû jiyana rojane ya Kurdan di xwe da dihevwîne, pir giranbiha ye, di babeta xwe de serekaniyeke tekane ye. Ev pirtûk li ser jiyana Kurdan ya civakî û etnolojiya wan berhema herî pêşîn e ku bi destê Kurdekî hatiye nivîsîn. Jixwe ji pirtûkên Bazîdî ya musteqil û serbixwe ev xebat e. Ango ev xebata wî, ya herî

¹¹Zana Farqînî, *Ferhengê Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2004.

orijînal e. Lewra nivîskar bêyî xwe bispêre jêdereke nivîskî, der heqê jiyana Kurdan de bi taybetî yên Koçer, bi kurtasî lê têrûtijî agahiyan dide û wan nasandin.

1. URF Û ‘EDETÊN HERÊMA AGIRIYÊ

1.1. YÊN JIBÎRKIRÎ

Bi demê re, car bi car li gor demê hin kevneşopî tîn jibîr kirin. Lê piştî ku ew dem buhûrîn, êdî hin kevneşopiyên din diafir in û dijîn. Bi vê yekê re, mirov dikarê bêje ku her dem li gorî xwe kevneşopiyên xwe çêdike, civak û mirov jî li gor wan kevneşopan dijîn. Le belê em dibînin ku; teknoloji, enternet, aborî, koçkirin a ber bi bajarên mezin, globalîzm hvd. bandoreke wisa li ser kevneşop, çand û ‘edetên hîştîye ku, hema hema li ser hemû gerdûne çandê hevpar e were avakirin. Tiştêkî ku li ber vê pêvajoya navnetewî bibe çareserî jî li vê demê de naye xuyakirin...

Di jiyana mirovan de obje cîhekî girîng digre. Ev objeyên ku paşerojê tîne bîra mirov, bi alîyekî din ve şewqa mirov bi xwe ye. Mirov bi xwe jî di nav jiyana ku ji objeyan pêk tê de dijî. Her çiqas di dema niha de be jî, ev yek di nava xwe de rêzedemekî dihewîne. Ev rêzedem wek şirîteke filmekî bûyerên ango bîranînên cur be cur tîne bîra mirov.(Assmann,b2001:25).

Kevneşopî rêç û şopek e. Ev şop carna çanda devkiye, ku ew jî fikrandineke ango xwe îfadekirineke cûda ye. Şop li ber serê me, cîhê ku em lê dinihêrin, di bedena me de, di nav tiştên ku em dest didin ser de, li derve, li hûndir û li her derê gerdûna mirov dagirkiriye. Ew şopên pirhejmar yên paşerojê... “Tevahî kiryarên mirovan yên ku di paşerojê de pêk hatine bi tenê bi rîya şopên ku dû xwe hîştîne tê zanîn. Ev şop car dibe hestiyên ku hatine veşartin li eniyên romayê, carna dibe nêrîngeheke Normana ku bi tenê dîwareke ji wê maye, carna jî dibe peyveke nû hatiye keşfkirinê di nivîsên yewnanî ku ev peyv bikaranî- na xwe ve fikrekî ango nêrîneke zelal dike. Ev mînakên me anîn ziman, nîşanên ango hêmanên kirûyekî bi lebatên hissî ve tîn fehmkirinê ne. Lê bi alîyeke din ve derfeta ku mirov rasterast bigihêje wê kirûyê jî nemaye”(Connerton,1999.25).

Di salên 1980’ an de gelek zarokên Kurd li gund û bajarên di qada pêşketinê de nebaş ango zêdetir di jîyaneke xwaziyê de mezin bûn. Zarokên vê nîfşê hîn jî şahidên çîrok, wêne û figûrên yên ji demên berê dibûn. Ev tiştên ku şahid dibûn hêmanên çanda devkî ne. Bi rastî ev hêman bi saya serê pêvajoya modernîzma Tirkiyê ya bi lez dihatin ji bîrkirin an jî ji bîrvekirinê bûn. Ev nîfşa ku ez bi xwe jî di nav de mezin bûm, bi şeweyên fikrandinê ya di

çanda devkî ve hatiyê hûnandin de û bi şert û mercên an jî bi teşe û awayên ne modern de jîyana xwe derbas kirin. Li bajarên ku em bi zorê an jî bi dilê xwe koç kirin de, me dît ku çawa kal û pîrên me xwe bi kevneşopiyan girtin û bernedan. Ber bi dawiya sedesala 20'an de, ew nîşên di nav 1- Xwendekarê doktorayê yê beşa civaknasiyê li Zankoya Mîmar Sînanê kevneşopiyan de dijîyan, xwe di nav bombedumanên modernîzma teknolojîk ya bilez de dîtin. Bi taybetî salên 1980' an de Kurdên ji gundên xwe koçî gettoyên bajarên mezin bûne zêdetir xwe bi kevneşopîyên xwe girtin. Ev helwesta wan li hember veguherînên bilez ya modernîzmê, nêrîna kapîtalîzmê ya bi awayekî hundirê wî vala û homojen demê dihesibîne û dîsa li dijî bi awayekî hovane li her tiştî metakirina kapîtalîzmê bû. Li ber van hemu êrîşan koçberan xwe avêtin ber bextê bîra xwe ango bi bîra xwe hembêz kirin. Ji ber ku bîr çiqas dem derbas dibe winda dibû. Bajarên modern û mezin “ di çarçoveya aboriya pere de gerdûnê veguhastine problemeke matematîkî pêdandine” (Simmel, 2006: 89).

Bandora van tiştên me vegot tevahî bi awayekî tenêkirin û serêxwekirinê li ser Kurdan bû. Ev tesîr nav Kurdan de di serî de bû sedema xwestina vegera jiyana devkî. Ew tiştê ku dixwestin ango çanda wan a berê ya xwezayî û komî ji bo wan stargeheke germ bû. “Bîr berî her tiştî li hember bi alîkarîya meta ve tiştbûyîna kapîtalîzmê re wek panzehîreke hêz û jiyani berxwe dide. Bi wi re bîr gaveke girînge ji bo girankirina pêvajoyên kirarî agahîyan; berxwedana li dijî xelandina demê ya di nav senkronîzma arşîvan de û ji nû ve bi destxistina şêweyekî fikrandinê ya bê cîhana ku ji şibandin, herikandina bilez ya agahiyan û torên qabloyan pêk tê. Paşê bîr di nav gerdûneke bi piroletî agahî lê hatiye barkirin, heterojeneke ku gelek caran gefxur û mirovan gêj dike û bê hemdemiyê de wekî deriyêke din rola xwe dilîze” (Huyssen, 1999: 19)

Di nav me de ew kesên ku bêhtir modernîst bûn ji van kevneşopiyan nefret kirin. Li gorî wan hewce bû ku civak were “ ronîkirin” û şêweyên têkiliyên “paşverû” di nav gel de bihata paqîjkirinê. Ew kesên ku piştî xwe dabûn hîpotezên teoriyên modernîzma klasîk tiştên kevneşopî wek hovîti û dema wan borî dipejirandin. Bi vî awayî van mirovan demên pêşiyê kevneşopiyan wek rêgezeke dema feodalîzmê û şêweyên jiyana kevneperest dîtin. (Özbek, 2003: 33)

Di navbera kevneşopî û van kesên ku me qala wan kir de hîn jî nakokî û pevçun didomin. Lêbelê yên bêhtir kevneşopgerên me, kevneşopiyan wek hesreteke romantîk mezinkirin. Li ber çavên wan kevneşopî ew tiştê ku em jî ji pêk tên “puxt” bi xwe bû. Lewra

ji bo ku “puxt” ji destên me neçe ango neyê windakirin, hewce bû ku kevneşopî were jiyandin û parastin. Di nav pêvajoya netewîbûna Kurdistan de bi taybetî salên 1990’an de ew kesên ku me li jorê behsa wan kir ango her du aliyên ku kevneşopiyê bi nêrînên cuda dinihêrin kevneşopî birin kirin navenda plansaziya netewîbûna Kurdistan. Kevneşopî ji vî demê pê ve li gorî plansazî netewîbûna Kurdistan hate hilberîn û hîn jî hilberîna wê didome. Gelo em kevneşopiyê çawa bihesibînin ango çawa bifikirin? Em kevneşopiyê wek forma civakîbûnekî ideal û bêqisur bibînin? An jî bi rêyeke dirêj û zehmet ve em 214Toplum ve Kuram, Sayı: 5, Bahar-Yaz 2011 kevneşopiyê gerdûneke nû ve -utopyaya şoreşgerî- (Löwy, 1999: 219) girêbidin?

Bê gûman hewceye ku em kevneşopiyê ji destên tiştêbûyinkirina (metakirin) kapîtalîzmê, kategorîzekirina hişk ya modernîzmê, kevneperestiyê û neteweperestiya bi hov rizgar bikin. Jin û mêr, xizan û dewlemend hwd ji her çînê ew gelê nexwendî û nenîvîsandî, çanda devkî û kevneşopiyên heya îro bi xwe re anîn. Di nava tiştê ku anîn de xwestekên wek maf, edalet, wekhevî ji bilî van dîsa xwazî û hesretên cur be cur yên civakî hene. Xwestekên civakî mîna hestekî, gotinekî û dengê hevpar cîhê xwe di nav kevneşopiyên devkî de digirin. Ev deng û gotinên ku gihîştine roja me divê wek peyamekî wek mizgîniyekî hêz bide utopya şoreşgerî ya pêşerojê, dîsa bêrawestand divê xwe biavêje nav xewnên civakî bêçîn yên guhdarvanên ber qirîn û gaziyên çîrokbêjan. Ev peyama ku ji tinebûnê filitiye xwe avêtiye ber bextê me lazim e ku bibe wek stargehekî ango nîşana berxwedanê li dijî tinekirina kapî- talîzmê. Di derbarê vê mijarê de ka werin em berê xwe bidin gotinên Walter Benjamîn; “Hebûna kevneşopî bi xwe û ew kesên ku kevneşopiyê didomînin ango wergirtine di bin talukeyê de ne. Ew tiştê ku her duyan re jî gef dixwe yek e. Ev gef bêguman listokbûna ango amûrbûna çîna serdest e. Li hember konformîzmê ku ew dixwaze kevneşopiyê bigire û têke destê xwe xebat divê. Ev xebat jî têkoşîneke ku xwe herdem ji nû ve dike ye” (Benjamin, 2006: 41,42).

Şêwazeke Çawa: Divê xebatên kevneşopiyê nekevin pey lêkolîneke bingehkolîna figureke qerisî û bêrih ya demên berê. Xebat û lêkolînên kevneşopiyê di serî de bi her aliyê ve tiştên niha derdixîne ber çavan. Ew dixwaze ku bîra aktuel bila bê fehmkirin. Ji ber van yekan xebatên kevneşopiyê divê şêwaza bingehkolînê ji xwe re û lêkolînên xwe re esas bigire. Ji bo ku ev têkoşîn bi serkeve hewce ye ku li hemberî êrişa pêdandina tiştê ku wek “gotinên yekîtiyê” tê binavkirin berxwe bide an jî li dijî van gotinan êrişekî bide destpê kirin. Di

vêtêkoşînê de ji nû ve keşkirina zanebûna xweser û loqal heye ku ev zanebûn hatiye perçekirin û bindestkirin. Bingehkolîner ji bo ku bi her alîyê ve dema niha derxîne ber çavan ango zelal bike dixebite. Bi vê xebata xwe ve derî li firsendên jiyânê hîn hêsantir û dewlemendtir dikin vedike(Mahon, 1992: 100).

Ser çend mînaken kevneşopî yen hatine buhurîn yan jî veguhirîn u ûbîrkin bisekinin. Evan adet û kevneşopan bere çawa bu û niha çawa ne berhevdanekî bikin. Cudatiye ku bi deme re derketine hole çine em le binerîn.

1.1.1. Dankutan

Dankutan kevneşopiyeye çandî ye û tê da genim bi awayeke hunerî tê lêxistin, da ku genim ji hevkeve û meriv pê savar (bulxur) û ardê çêbike. Dankutan di çanda Kurdan da rolekî pir mezin dileyze û him ji hêla sosyolojîk ve him jî ji hêla hunerî ve rîtuêke balkêş e.

Dankutan di gelek civatên Rojhilata Navîn da tê dîtin. Di civata Kurdan da dankutan bi pîranî ji aliyê mêran ve tê kirin, lê jin jî yek caran vî karî dikin. Di rîtuêla dankutanê da gund piştî ku genim kom kirine ji bo lêxistina genimtê cem hev, da ku genim bi dankutanê ji hev bikeve û meriv karibe jê savar (bulxur) yan jî ard çêbike.¹²

Ji bo ku karên rîtuêla dankutanê were lidarxistin du alet pêwîst in:

-Mîrkut: Aleteke bitexte ye û ji bolêxistina genimê tê bikaranîn.¹³

-Curnê Savar(Sokanî, mustux): Kevireke bi kort e û bi genim tê tijîkirin.¹⁴

¹²**DAY FELEK YILDIZ Û MALBATA WÊ,** *Devera Serhedê,* Gihadîn- Agirî 1945. Ragihandin: 11 Adar2017.
DAY HECÎ ZUMRET ÇAKAN Û MALBATA WAN, *Dervera Serhedê,* Gihadîn- Agirî 1935. Ragihandin: 21Sibat 2017.

¹³Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004.

¹⁴Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004.



Wêne: Jinên kurd dankutanê dikan.


Bi aşên savare ra her kesî xwe da ser bilxura amade. Zexîre girtin u amadetiya zivistanê edî wek berê nîne. Keç û xortên niha jî alîgire (tereftare) van kara nînin. Ser bidera dema piştî zevîdirunê wek salên buhirî, jin û merên ku li meydana gund û di nav navçeyande dankutanêdikan hema hema edî nayên dîtin.¹⁵

1.1.2. Cil û Berg

Cil û berg jî çandeka Kurdan a kevnareye. Ew kinç jî wek amûrên din li gor sed salan tînan guherandin yan ji bîrkirin. Ji yana rojane ya Kurdan da em dibinîn kû bandora dinyaya moderin tesira xwe li ser cil û bergên Kurdan da ji xwe dide nîşandin. Hinekane ji dide birkirin. Dema ewilda meriv dikare bêje cil û berg jî çandeka rojaneyê, zûka tê guhertin û nûjen kirin. Li gor şert û mercên cihanê yê iqlimî, sportîvî, teknolojîkî û aborî û derfetên însanan xwekirin û pêkirina kesan tê guhertin.¹⁶

¹⁵Silêman Çetin, *Devera Serhedê*, Dutax-Agrî 1973. Ragihandin: 30 Cotmêh 2017.

¹⁶Heciyê Cindî-Emînê Evdal, *Folklorê Kurmanca Xozandax*, Weş.. Avesta, İstanbul, 2008, r. 479



Wêne: Cil bergên dewatan yên jinên kurd.

Hinek têgehên der barê cil û bergan da wisa tên rêz kirin. Lê belê kismekî wan êdî nav civake da hatinê rakirinê anjî birkirinê. Şal, saqo, libade, bedil, dêre, sermilk, kumik, berzendik, gerdane, bişkok, devdeling, tîşik, şimik, sol hwd. Roja me ya ku em niha dijîn wan têgehan medanê rabune. Cil û bergên yên Kurdan kû êdî nav civakê da hatine bîrkinê û rabûne şal, şepîk, kofi, xêlî, xegal, serpoşî, peçê hwd.



Wêne: Cil bergên dayîka ka Serhedê.

1.1.3. Reşgirêdan (Şingirtin)

Reşgirêdan:Şîn, matem, taziye.¹⁷

Berê da nav Kurdan da dema ku kesek bimire şîn tê girtin. Piştî mirina wî kesê/î li gor urf û ‘edetên kurda serxweşî te girtin. Reşgiredan zêdetir nav milete Kurd da ji bo mêran û li mirina ciwanan zêde şin u matem (şin) digirin. Cil û kincên(libasê) reş wedigirin û serê xwe reş girêdidin. Ûjin û keç û xwe, guliyê xwe jê dikirin, demeka zêde matem û şin dikirin.

Eger ew mirî mêt û xweyî hesp û çek û taxime, hespê wî dixemilinin û çek û sîlha wî li ser hespan girêdidin, ewan hespan li berayikê cenazeyî dikêşin. Û ew jin û keç û dayik û xweyên wî delo ‘de lo yan ji de lawo’ lawijek dibêjin: ‘ Way min babo, wi li min bira! Way min pismam ‘ dibêjin û digirin û deng û sedaya bavo bavo ya wan diçe feleke. Yanîmirovêkî biyanî jî rast şîna wan bê elbette dilê wî disoje û digirî. Bi vî terzî bi îhtîşam û hurmet û qedirgirtin dibin çal dikan. Û ew jinê kû guliyêxwe birine ewan guliyên li ser qebra wî mirî likêleka wî dadiliqînin. Heta panzdeh rojan sibe û êvaran jin û mêt û ciran têne ziyareta qebra wi, dixwinin û digirin û sedeqe û xêran dikan. Ew mirî eger mêt ve,kincekî wî bi qîmet, mesela qaput û kurk û an jî şalekî bi biha davêjine ser cenazeya wî û dibine qebrê.Û eger jinek be, dîsa lîbasekî webi qîmet davijine ser cenazeyî weû dibine qebre. Ex libasê ku avetine ser cenazeyî, ew ji bo melan in. Û mela difiroşin û li yekûdu parî vedikin.¹⁸

Heta heft rojan zad ûxwarin li mala yêmirî nayê pêhtin ûpijandin. Cîran zadîfînin û bi mêt û jinê wê malê didine xwarin.¹⁹

Heft roj ku tamam buyin ciran diçin cil û bergên mirî dişon û paşê didine belengazû feqîran. Wekû heft roj buyi, mala mirî zaf helwa (şîranî) û zadan çêdikan û cîran û gundi û biyaniyan dikine gazi û bi xêra mirî didine xwarin û belav dikan. Û ew libasê reş heta demeke dirij li ser ehlê û xizmêmirî diminin. Ew ehlêmirî heta jişinê bidernekevin naçine dawet û kêfxweşiyên. Wekû dema xemginiyê tamam bûyî axayê wan û xizmeki wan ji bo her yekî ehlêmirî, anegore halê xwe tişteki tîne û reşê wan heldigire, jişinê biderdikevin.

¹⁷<https://books.google.com.tr/books> r. 397;Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdi-Tirki*, Weşanên Enstîtuya Kurdi Ya Stenbolê, Stenbol 2004.

¹⁸Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2012, r.98

¹⁹**HECÎ MEHMET POLAT**, *Devera Serhedê*, Gihadîn- Agirî 1934.. Ragihandin:19 Sibat

Ev edetên ku me li jor behs kir her çikas li ba kurdan nehatibe ji birkirin jî, di ritûeli we de cudayî û guheran çe buye. Berêşînê heft roj dewam dikir, dawiyê de xweyê şîne mewludek dida paşe jibo xêra wî mirî xwerin û şîrînayî didan mivanan û şîna xwe diqedandin...

Ekraba û cîranan bo parvekirina hizn ûxemgînî ya mala şîne televîzyon û radioû teyîbên xwe venedikirin. Dawet û şayîk hebûya bo wî ji mala şîne destur dixwestin. Dile wan xweş dikin paşî dawet û şayî ya xwe dikirin.

Li belê, bi sazkirina çadır û malen serxweşiyê (malên taziye) re hin ritûelen şîna de cudayî çibu. Xwerin û vexwerin, serxweşî, şîn û hwd. di wan çadir an jî malan da te kirin. Şuna heft roja edî se roja şîn didome. Televîzyon hwd. naye temirandin. Bere şîna de, du mal se mal dibun yek, gazî mevana dikir. Le niga hemû xwerin û vexwerin li malen tazîye da dibe. Kesen ku têne şîne nav xwe lîsteki da didin nivis û paşî mesrafa şîne çî qas be di nav wan kesadan parvekirin. Hemû kes sere wan çî qas ketibe wî pereyî teslîm dikin. Ji kesî ku liste dinivise û pera berav dike re dibijin “çawuş”. Gel di nav xwe de, vî karî wek xer û deyneke dibîne.

Dawiyê da xweyî şîne mewludekî dide û piştî mewlûdê spasiya xwe ji milete ku hatiye mewlûd ûşîne peşkeş dike û şîn diqede. Paşî şîn, çend roja daha li mala xweyî şîne de, di nav eqreba ye nêz da dewam dike...



Wêne: Şîne Kevn



Wêne: Şînek çadira serxweşiyê de..

1.4. Zewac û Dawet

Dawet di gerdûne da rîtualeke hevpar e. Li ser dinyaye ku zewacek çibe ew waxt şahîk jî pera dest pê dike. Lê belê hemû dewlet an jî miletan gorî ‘edet û çanda xwe wan rîtuela tînin cih. Li ba kurdan dawet çawa dibin em bi kurtasî bala xwe bine û paşê jî bi deme ra guhurdetine we çine emê wan bibînin.

Berbû;Jina ku bi bûkê ra mijûl dibê, heval bûk.²⁰

Însanên me ên berê zarokên xwe zû dizewicandin. Hinek malbat ji bona ku murweta zarokên xwe bibînin, hinek ji bona ku zarokên wan zû çêbibin û di îş û karê malê de alîkarîya wan bikin û hinekan jî, ji bona ku zarokên wan ên kurin (lawîn) hebin loma zû dizewicandin. Li gundan kurê mirov hebuya hem ji bo karê dinyayê û hem ji bona mêr û mêrxasîyê, mirov di nav gund de rehet karibu serbilind bigeriya.

Heta van salên dawîn jî, pirranî kes, berê eskeriyê dizewicin. Pirr kes berê eskeriyê dibun xwedî ewlad û tewlad. Lê wan salên dawîn ev urf hinekî sist buye. Ezê di vir de ji we ra qala serpêhatîyek xwe bikim.

Însanên me ên berê zarokên xwe zû dizewicandin. Hinek malbat ji bona ku murweta zarokên xwe bibînin, hinek ji bona ku zarokên wan zû çêbibin û di îş û karê malê de alîkarîya wan bikin û hinekan jî, ji bona ku zarokên wan ên kurin (lawîn) hebin loma zû dizewicandin. Li gundan kurê mirov hebuya hem ji bo karê dinyayê û hem ji bona mêr û mêrxasîyê, mirov di nav gund de rehet karibu serbilind bigeriya.

Heta van salên dawîn jî, pirranî kes, berê eskeriyê dizewicin. Pirr kes berê eskeriyê dibun xwedî ewlad û tewlad. Lê wan salên dawîn ev urf hinekî sist buye.

Êdî heta xort eskeriya xwe nekin, kes keça xwe nade wî û dê û bavê kurik jî kurên xwe nazewicînin. Berê salê zewaca keçikan 14-18 bu. Lê keçên me edî bi pirranî ser bîstan re dizewicin. Li gundan hindik mabe jî ‘edetên berê dewam dike.

Berê li gundan ji bo zewacê dor hebu. Heya birayên mezin nezewicîya, ên piçûk nedizewicîn. Lê îro ev ‘edet jî guherî. Carna birayê piçûk riza birayê mezin digre û berê wî dizewice.

Dema xort dihate wexta zewcê, mirazê xwe yan ji xuşka xwe re, yan ji, jina birayê xwe digotin. Bêdebiyek mezin bu ku, kur viya ji dê û bavê xwe re bibêje. Van salên dawîn êdî jê dê re jî tê parvekirin lê hîn jî ji bavê re nayê gotin. Lê li bajaran ev tişt pirr guherî ye. Bav û ewlad rudinên û qala evîndarên xwe dikin.

²⁰<https://books.google.com.tr/books?> Umid Demirhan, *Ferhenga Derstî*, Çapa elektironikî.

Di vê xisûsê de keçik qe nedixivîn. Lê dema ji keçikê sewal bikirana, eger dilê wê tunebuya, eşkera digot ez naxwazim, eger dilê wê hebuya digot: “hun zanin.” 21

Li hinek cîyan hinek ‘edet û usulên daxwaza zewacê bi vî awayîbu:

Êdî heta xort eskeriya xwe nekin, kes keça xwe nade wî û dê û bavê kurik jî kurên xwe nazewicînin. Berê salê zewaca keçikan 14-18 bu. Lê keçên me edî bi pirranî ser bîstan re dizewicin. Li gundan hindik mabe jî ‘edetên berê dewam dike.

Berê li gundan ji bo zewacê dor hebu. Heya birayên mezin nezewicîya, ên piçûk nedizewicîn. Lê îro ev ‘edet jî guherî. Carna birayê piçûk riza birayê mezin digre û berê wî dizewice.

Dema xort dihate wexta zewcê, mirazê xwe yan ji xuşka xwe re, yan ji, jina birayê xwe digotin. Bêdebiyek mezin bu ku, kur viya ji dê û bavê xwe re bibêje. Van salên dawîn êdî jê dê re jî tê parvekirin lê hîn jî ji bavê re nayê gotin. Lê li bajaran ev tişt pirr guherî ye. Bav û ewlad rudinên û qala evîndarên xwe dikin.

Di vê xisûsê de keçik qe nedixivîn. Lê dema ji keçikê sewal bikirana, eger dilê wê tunebuya, eşkera digot ez naxwazim, eger dilê wê hebuya digot: “hun zanin.” 22

Li hinek cîyan hinek ‘edet û usulên daxwaza zewacê bi vî awayîbu:

Bi gelemperî lawik û dê û bavên wî gelek caran digel wan xwişka lawik a mezin jî bi hev re diçin mala keçikê. Dema çûna mala keçikê, malbata lawikî bi xwe re tiştên xwarin û vexwarinê dibin. Dema ku çûn malbata lawik û malbata keçikê bi hev re dişewirin. Keçik ji mazûwanên xwe re çayê amade dike û pêşkeşî wan dike. Pişt re jî lawik û keçik, carna jî li gel wan xwişk an jî dotmameke keçikê bi wan re diçin odê û bihev re dipeyîvin. Di odê de ji şert û mercên xwe ji hev re dibêjin û heger keç û lawik li hev bikin, daxwaza xwe a zewacê ji dê û bavên xwe re dibêjin. Ku malbatan jî li hevkin û ku qedera wan jî çêbibe, zewaca wan çêdibe. Piştî lihevkerinê dema şahiyê tê, yanê dema nîşanê tê. Nîşan, di zewacê de merhela herî serî ye, dema nîşanê malbata lawik ji bo nîşana xwe gustîl, bazinên û xelatên xwe distînin û amade dikin. Her du alî jî ji bo nîşanê gazî heval, meriv û cîranên xwe dikin.²³

²¹Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbîharê, Stênbol 2012, r.98

²²Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbîharê, Stênbol 2012, r.98

²³<http://candname.com/daweten-herema-muse-1/> 06.04.2018.

Çanda dawetan bi rastî jî di nav me Kurdan de ciyekî girîng digire. Gelê Kurd ji kêf û şahiyê pir hez dikin, ji ber vê yekê jî dawetên Kurdan wek mîna mîhrîcanan xweş û geş dibin.

Lê belê di nav dawetên Kurdan de li gorî herêman cudahî derdikevin holê. Em vê cudahiya di nav dawetan de dikarin li her herêmê bibînin. Lewra çanda her herêmê cuda ye. Di çand û hûnera me de, di dîroka me de evîndarî pir muhîm e. Di çanda me de gelek çîrokên evîndariyê hene, mîna ku Mem û Zîn, Sîyabend û Xecê, Derwêş û Edûlê hwd. Bi rastî jî eşq tişteki xweşik e û di navbera keç û xortan de jî gelek caran eşqê mezin çêdibin lê mixabin hemû aşiq jî nagêhêjin mirazê xwe, lê dema ku digêhêjin mirazê xwe jî ew car bi daweteke mezin û geş re diçin ser mirazên xwe. Em niha ji herêma serhedê ji bajarê Mûşê mîna keke dawetan bidin, ka em lê binêrin ew dawetên xweş û geş çawa çêdibin.

Li herêma Agiriyê dema ku xortek bixwaze bizewice şertê pêşî divê eskeriya xwe kiribe. Piştî eskeriyê eger lawik ji xwe re keçek nedîtibe dê û bavên lawik li gor malbat, çand û ûrfa xwe ji lawê xwe re li keçekê digerin. Hin ciwan jî piştî eskeriyê diçin ji xwe re kar dikin ji ber ku qelenê rinda xwe temam bikin. Li herêma Agirî nextê keçikan di navbera 20 an jî 50 zêrîn (kelle) e.

Ew tiştên ku min qala wan kir di çanda berê de hebûn, lê niha tiştên wisa kêmane. Heger dildarîyeke lawik hebe, ew ji diya xwe re dibêje û diya lawik jî ji zîlamê xwe re dibêje. Bi vî awayî bavê lawik diçe ji bavê keçikê re qala rewşa wan dike û heger ku bavê keçikê qebûl bike vê carê bavê keçikê diçe ji xanima xwe re behsa xwezgîniyan dike, xanima wî, jî ji keça xwe re dibêje, heger keç qebûl bike, rêya mala xwe didin xwezgîniyan. Malbata lawik diçe xwezgîniyê.



Wêne: Dewatên berê li gundên Agiriyê.

Wekû dibe dawet, hinne datînine nava destê zavê. Kurên nezewicî ji hineyê destê zavê direvînin û datînine nava destê bûkê. Keç jî ji destê bûkê hinnê direvînin, goya eve nîşaniye ku iqbal û bexten wan keç û kurên nezewicî jî vebin û ew jî bi zûyî bizewicin. ‘Edetke wisa li welatên rojavaye jî heye. Buk baqeguleke di deste xwe de hildire, hin keç jî li pişt we ne, beyî ku li wan binere we baqegule daveje ser koma keçikan, eger ke ew zeft kir bexte we jî nezîk buye. Ew ‘edet dawetên Tirkan da jî te xuya.²⁴

Eger mala bûkê nêzik e, du mirov ji eqribayê merivên zava dikevîne bin çengên bûkê û hêdî hêdî bûkê tinin. Eger mala bûkê û zavê ji hev dûrin, bûkê li hespekî bi xeml siwar dikin ûtînin.

Weqtê bûkê hate derê malê, zava û çend xortên nezewicî li cihekî bilind disekin û zava bi kulman, peran direşîne serê bûkê û zarok û fuqere ewan peran berhev dikin. Wekû bûkê hate ber derî, naçe hindurê xanî û ya kon. Îcarê xweyê dawetê xelatekî dide bûkê. Paşê ew bûkê diçe nava malê. Weqta bûkê çûye nava malê, legen, misîn tinin, ew bûkê dev û rûyê xwe

²⁴.Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stênbol 2012, r.98

dişo. Şerbet û şeker ji bo wêtinin belav dikin. Paşê ewê bûkê jî dibin û dixine govendê. Elbette bûk jî dê çend gerrekan (dewran) bilîzi, çare nîne. Piştî çend geran nevberekî didin govende. Xwerin vexwerin ji bo siwarên dawete tenîn. Di pey de ew kesen wek siwar hatine dawete, xelatekwe davejin ser nan. Paşê wekû bi şev zava gerdek bûyî, ji lawan çendek dikine şayî û tepançe (diteqînin) agir dikin.

Dawetên zemanênberê malan da, konan da û hewşan da dibu. Dengbejan govend digerland. Kîlam daweten ser buk û zave. Buk gavende da dilîst û ji bilîwî jî lîstika buke eyb bu. Weqta kû buk daxile govende be govend giran dikişê.



Wêne: buk siwarkirin û daweteka demên niha û ya kevnare.

Belê daweten îro de cudatî çiyê? Bi peşketina aborî û modernîteya ra wak gelek tiştêndinan rîtuêlen dawetan jî guhurî. Edî siwarbuna buka bi otomobîle luks ve te kirin. Mala buke nêz be jî dûr be jî bi konvoyan bukê digerrîn. Dawet salonên bi teybet da tîn kirin. Xelaten ku ten awetin di bin objektîfen kameraya de ne. Buk dawetan xwe de bi zave re dans dike u dilîze. Ev yek edî eyb naye xuyan. Jî bilî govende cur cur lîstiken cuda ten peşkeşkirin. Şuna dengbejan orkestra û muzîken modern (ewrupayî) te lê xistin. Cil û bergên ku tîn xwe kirin jî yê mehelî nînin. Kesek edî behsa qelend e buke nake. Çunkî goya ev kar rabuyî û şuna wî xelatşîr (sûtperesî) heye. Lidi bajaren mazin de edî ew yek jî zêde naye xuyan.

Demên bere de derxistina bukan de ser sandik a buke rudiniştin, yan jî derî li buke digirtin ji boy standina xelat u hvd. Li ew adet jî zede nav Kurdan de nema. Kirine wisa edî te eybandin.

Weqta kû bûke tînin, jinek ji mala zavê berbûk dibejin diçe mala bûke û jinek jî ji mala bûke dîsan berbûk dibejin digel bûke te mala zave. Bûke siwardikin û miqdarekî siwaran li berayike (peşwaziye) dilîzin. Ê bi kef tînine mala zavayî û mahre wan dibirin (nikahe

dibirin) û bi şev didine gerdeke (hewirgeha bûk û zave, cihe razana wan). Paşt se rojan ewan jinên ku bûne berbûkî her yekî xelateke didine û bi re dikin. Paşt demeke mala bûk û zavê gazî hevdû ziyafete dikin. Mer û jin digel cîran û xizman û hediye (diyarî) didine hevûdu.²⁵

Le niga, bi modernite re, ev ‘edet hatiye guhurendin. Dibe ku carekadin behsa nave berbukaye hebe li ev yek wek seramonike sembolik maye.

1.5. Libûjenî (Kulav Çêkirin)

Libûdîtî, libûjenî, livajenî, kevanjenî, kurincî, tavnejenî, perekerî hwd.²⁶ di nav milete Kurd da wî karê kulav çêkirinê ra dibêjin libûdîtî. Ê ku kulavan çêdike an jî wî karî ra meşqûl dibe, jê ra dibêjin libûdî an jî libûjen.

Li gor îro panzdeh û bîst sal berê kê m zêde hemû bajar û navçeyên kurdan da libûjenek ya dudu, sisê hebûn. Ewan ji bo millet kulav davêtin. Zêdetir gundiyan liba (hiriyan berxan) danî dida libûtiya, ewan jî ji boy wan kesa ew liba bi motîfên ji hev cudatir ve çedikirin û kulavên wan davêtin.



Wêne: Li herêma Agiriyê kulav çekirin.

Lê hinek bajarên kurda taybeti jî bajarên mîna Agriya Serhedê gelek cihan wek pîşeke pêre qezenkirinê liborciyan gund bi gund demsala bayîz û zivistana derengî ew karê kulav çêkirinê wek hûnerekî malan digeriyan rojên sar da hindirê malê da kulavên cure cure davitîn.²⁷

²⁵ Zeynelabidin Zinar, *Xwençe*, Cild 4, Weş.. Kultura Kurdî, Pencînar, Stockholm, 1990, r. 20

²⁶ Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2004;

²⁷ **DAY HECÎ ZUMRET ÇAKAN Û MALBATA WAN**, *Dervera Serhedê*, Gihadîn- Agirî 1935. Ragihandin: 21 Sibat 2017.

Berê hema hema hemû malekî de kulavek dudu hebû. Le îro mixabin ev pîşe û kar edî nayê xûyan. Kulav çiyê an jî libûdî çî karî dîke di nav neslên nû da kes nizan e. Em dikarin bibejin ku ev kar jî hedî hedî di nav gel de tê bîrînin e.

1.6. Kosegelî

Kosegelî yek ji cureyê zargotina kurdan e û di edebiyata devkî de cihekî giring digire.

Kose an jî kosegelî li hin deveran bi navê "kalê û pîrê", "apo û etê", "kalê gaxan", "serê salê" hwd. tê binavkirin.²⁸



Wêne: Xemilandina kosegelî ya bi çawa.

Lîstika kosegelî cureyekî ji şanoyê civakî ye. Kose jî lehengê vê lîstikê ye. Berê (hin ciyan hê jî ev adet didome) li gundan salê carekî, dema ku sed rojê pêz timam dibû hingê rênçber û xulamên gund li malekî de dihatin cem hev û wê şevê xwe ji bona kosetiyê amade dikirin. Mala ku tê de dihatin cem hev cil û kincên ' ecêb li xwe dikirin, çend roj beriya vê rojê dihate diyar kirin. Beriya sedê pêz, nav xwe de diaxivîn û digotin: Emê îşev malan filankesê de bicivîn. Rênçber û xulamên gund bi çawa mil û lingên xwe, singê xwe dialandin.

²⁸Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2004.

Rûyên xwe jî bi ardê, spî dikirin. Piştî wan wesem/makyajan êdî kesî wan nas nedikir û nedikarî bibêje ka ew rênçberê kî ne. Piştî wan karûbaran êdî ev rênçber û xulam dibûn kose û diketin nav gund û mal bi mal digeriyan. Şivan, gavan, berxvan, xort û zarokên gund jî didane pey wan. Wê şevê kose bi zar û xortên derûdora xwe, hemî malan digeriyan.

Hin şanoyan de kose dixeriqe dikeve erdê, dema bûk hin tişt ji kebanîya malê distîne, hingê kose jî radişe ser pîya. Hin caran jî satilek av dirijînin ser kose ku bila were ser hemdê xwe. Lê bi guherîna zeman re edî li navçe û bajaran de cihê ard, hêk, şeker û rûn em dibîbin ku dirav/pere hildaye.²⁹

Kosegelî yek ji cureyê zargotina kurdan e û di edebiyata devkî de cihekî giring digire. Berî şeş hezar salan di mitolojîya Sumeran de jî ev lîstik te xuyan. Kosegelî di navbera çanda Kurdan u çanda Sumeran de wek pirayekî ye.

Kosegelî di meha sibate de dest pe dike (15-28 sibate). Çunkî ve mehe da pez dizen u Kurd ve yeke wek zede hî u berekete dibînin. tê binavkirin.

1.7. Berdelî û Beşikertme

Berdelî: Jin û keçên ku ji bo zewacê bi hev hatine guhertin.³⁰

Berdelî an jî bedelî, nave xwe ji berdel u bedele digire. Peyveke Erebi ye. Ew yek jî te wateya tiştên ku beranber te mûbadele kirin e. Ba kurdan jî ev awayekî zewace ye.

Di nav kurdan de wek hinek curên din berdelîjî ji bo zewacê dahat kirin. Yeki xuşka xwe dida yeki din û xuşka wî jî ji xwe ra dixwest. An ji keça xwe dida yekî û keça wî kesî jî ji bo xwe distan. Di nav xwe de tiranpê û guhertineçêdikirin. Her kesekî cihêz û mesrefa dewata xwe bixwe didit.³¹ Bi wî awayî zewacê da qelen nedahat standin.

Beşikertme: Ev peyv Tirkî yeji beşik yanî derguş û laneya zarokan û Kertmek yanî birrîn û qutkirin, birrîna sozê, hatiye bihev xistin. Wekî ji boy mirovekî keçek welidî (ji dayîk bu) û ji

²⁹<http://tirsik.net/index.php?mijarid=1799>

³⁰Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2004.

³¹Day Felek Yıldız û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Gihadîn- Agirî 1945. Ragihandin: 11 Adar 2017. Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2012, r.98

boy mirovekî jî kurek welidî heman di roja jidayîkbune de ewe keçe didine wî kurî. Beşikkertme dibejin. Heta ku kur u keç balix dibin edî poşmanî nabe.

Ledi nav gel de ew ev her du yek ji edî zide nay xuya. Neslen nu zetetir nizane ku berdeli yan jî beşikkertme çîye. Tek tuk hin deran ev adet weren xuyan jî, adetekî ber bi windabune diçe ye. Rabuna wan edetan, di nav kurdan de ji makul te kebulkirin.



Wêne: Berdêlî Wêne: Beşikkertme

1.8. Beranberdan û Sedîpez (Sedêpez):

Beranberdan: Wek cejnekeye li ba koçeran, keçik tenê desmalên xwe bi qiloçên beranan ve giredidin û xort jî ten wan desmalan vedikin bi wateya ku min ev keça xwediya desmalê hebandiye ûwê wek jin ji bo xwe dipejirînim.³² Mihricaneke kurdan e, gelek çavkaniyan da tê behskirin. Yek wan kitêban jî kitêba *Erebê Şemo* ya *Şivanê Kurmanca* de hatiye behskirin.

Sedîpez (Sedêpez): Pez sed û pêncî roj avis dimînin. Kose an kosegelî jî li gorî hisaba avîsbûna pêz, xwe di şeva sedemîn de amade dikir. Di nav kurdan de navê vê rojê sedêpez hin cihan jî sedîpez e.

Wek ku daner bi xwe jî dide nasîn, piştî buhurîna sed rojê wan beranên ku xemilandibun tev li keriyê mîhan dikin û şahiyê digerin.

³²Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stênbol 2012, r.98.

Beranberdan û sedîpez; wan jî dîsanî bi vî hesabî ye. Wekû payîz nivî dibe, ‘edet li nik wan kadançêdikin û dibin diçine nik keriyê mîhan. Û beranan jî dixemilînin û dibine wê derê. Îcarê ewan kadan belav dikin û dixwin, dikine şayî (şahiyê digerînin). Îcarê paşê beranan tevî keriyê xwe dikin. Weqtê ku sed rojê beranan tamam dibe, dîsanî kadê û xwarinê çêdikin û şayî dikin. Ji bo selametiya pezê xwe. Kurd eger çî hinde xweyî pez û rizqin, lakin ji bo xwe bi teybetî (ji nefsa xwe ra) pezan serjenakin. Li ku mevanekî maqul be anjî pezekî nexweş hebi, ewî serjedikin.

Li her ku diçe ev ‘edeta jî din av gel da te bîr kirin. Beranberdan neyê bîr kirin jî, rîtuêlen wî hedî hedî winda dibe. Ku waha dewam bike neslên be beranberdanê wek çîrokekî bi bîra xwe bîne. Gundî hedî hedî ber bi bajaran koç dikin. Ajaldarî edî te berdan ev yek jî bi xwe ra we âdetê ji holê hildide.



Wêne: Xemilandina beranan û beran berdan.

Cejna Beranberdanêheya van salên dawîn li gundan dihate pîrozkirin. Tê ji bîra min mûyê beranan bi boyaxa reng bi reng boyax dikirin. Xêlî ji dûvê wan ve girê didan. Hemûgûndî komî cihekî dibûn, zarokan dilîst felan. Paşê niza'm çawa bû ev cejna wisa carekî da hate jibîrkirin.

Bi pezên nêr ya du salî ra beran tê gotin. Beranê ku ji nav heywana ji bo tovê hatine girtin, li serê meha îlonê ji kerî tê veqetandin û li mal tê alifandin. Bi vî awayî ji pezê mê tê cê girtin. Nêriyê bizinan jî wiha tê cê girtin.

Beran berdan bi gelemperî li dawiyê meha çiriya pêşin anjî di hefteya yekemîn ya meha çiriya paşin dibe. Gorî îqlîma herêman ev tê rast anîn. Li herêmê sar beran dereng tèn berdan.

Li gundên Kurdên Anatolîya Navîn beran berdan bi tevayî li dawîya meha çiriya pêşin dibe û tê pîroz kirin. Ber berdanê beran bi boyaxê rengîn tê xemilandin. Xemlê ku ji morik û bendên rengîn hatine çêkirin bi stû û dûyê berên da tê pêda kirin. Xwedanê berana danûyê ku bi şekirê lewlewiya

tevíhevkiřî belav dîkin. Beran bi dehol, zurne û govendê tê birin nav kerî.

Dema berdayina nav miyan qîzeke biçûk li ser berên tê lê nayin. Li gorî bawerîya wê demê berxên ku bizen mê dibin.³³

1.9. Koçkirin (Koçberî)

Koçer:Ji bo balinde û ajalê ku xweyî jiyaneke koçerî ye.

Li ber niştecih bûna Kurdan koç û rêwitiya netewe Kurd nav xweyî ye. Ancax miletê Kurd, miletekî aryanî û rojhilata naverasta ta jiyana xwe ya hezar salan adirokî li we herême domandiye hêj didomine. Berê jî îrojîKurd ji ber derfetên xwe û li gorî rewşa aboriya xwe zozan bi zozan, çiya bi çiya koç kirin û çune cihên din. Bi wê koçê ra wan astengî û pelçiqandin ditin.

Milete kurd zemanê berê da ji bo hebûna coğrafya ya wan çiyayî û avedanî koçerin. Demsala bahar û payîze koçdikin ku ajalên wan debara xwe bînin cih. Diçine zozan û kişlaxa ji bêr ku jiyana û debara xwe bînin cih. Dewaran zêdetir, lizozanan, Gelên Agirî ji ber şert û mercên erdnigariyê pêz xwuyî dîkin. Şiwan û gavan kulav, heban, barxanê amade dîkin çarna hefteke zêdetir naynê ser malan heywanên xwe cihe zozan diçerinin. Evaran ji pêzên xwe li guhiran û warkozan tomar dîkin ku wek zirar negihejê.³⁴Zozanên bajarê Serhedê bi taybetî ye bajara Agiriyê ji bo ajalan pir mezin û navdar e.



³³<http://herema-ararat.blogspot.com.tr/2012/09/beran-berdan.html>

³⁴DAY HECÎ ZUMRET ÇAKAN Ê MALBATA WÊ, *Dervera Serhedê*, Gihadîn- Agirî 1935. Ragihandin: 21 Sibat 2017.

Wêne:Kalo debara xwe ajalên xwe difikire.

Koçkirin û zozan wisa bûye parçekî Kurdan ku ew heyata rêngin ketiyê nav hemu cureyên jiyana wan. We rastiye em nav stran û destanên Kurdan da ji dibinin.

Wek minak:

Malan barkir lê lê çûne waran lê
Dîne lê dîne lê dînara min
Goştê me xwar in lê mişk û maran lê
Keçê lê rindê lê bermaliya min

Ez sêwîme lo lo ber destame lo
Delalo delalo delalê min
Birîndar im lo lo bê xwedî me lo
Hevalo hevalo hevalê min

Malan bar kir lê lê koç bi rê ket lê
Dîne lê dîne lê dînara min
Dilê'm êşiya lê lê agir pê ket lê
Keçê lê rindê lê bermaliya min

Jana te ya dil jana min e lo
Delalo delalo delalê min
Ger min nedin ne gunehê min e lo
Hevalo hevalo hevale min

Malan barkir lê lê çûne waran lê
Dîne lê dîne lê dînara min
Goştê me xwar in lê mişk û maran lê
Keçê lê rindê lê bermaliya min.

1.10. Xwarin û Vexwarin

Xwarin û vexwarinên Kurdî jî wek urf û ‘edetên din pîr cure û pir dewlemendin. Xwarinên herêma Agiriyê zêdenin û xweşikîna. Goşt, Jejerun, xaşil, helise, kade, beşî, dewşewitî, keledoş, kifta evdîgor, xîngel, mirtoxe, savara bigoşt, keşk, penêre sîr , nanê mirtoxe û girar xwarinên meheli ne ku li herêmê tîn çekirin û xwarin.³⁵

Hinek “têgihên rojane der heqê xwarinan da”: Taştê, firavîn, şîv, paşîv.³⁶

Dema ku mijar bibe xwarin û vexwarinê Agirî, em dibinin wek dirokan wan dewlemendin.



³⁵Day Felek Yıldız Û Malbata Wê, *Devera Serhedê*, Gihadîn- Agirî 1945. Ragihandin: 11 Adar 2017.

³⁶Mela Mahmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stênbol 2012, r.98.

Wêne: Xwarineka a taybet xaşil bi runê helandî

Aşpêjxaneya kurdî, kulîna kurdî, kûxnîya êzîdiyan, metbexî kurdî, xwarinên kurdî ji cure û dewlemendiya xwarinên kurdî re tê gotin.

Di xwarinên kurdî de pincarên biharê, berhemên şîr, savar, sebze û goşt cihekê girîng digirin. Bi dehan cureyên kufteyê tîn xwarin.

Bi taybetî parêzgehên herêma Agiriyê, Bazîd, Gihadin, Panos û Zêtkan û gundê warên wan ji aliyê çêkirina kifteyan, kifta evdîgor, qelîyê ve gelek navdar in.

Taşîyên herêma bajara Agiriyê jî gelek dewlemend in. Hingiv, toraq, toxafk, to, cureyên penîran, hêk, zeytûn, kilor, jajî xwarinên bingehîn ên taştêyê ne. Bo vexwarinê jî pirranî çaya reş tê ser destexaneya kurdî.

Cure cure xwarinên sebzeyê, bi cure cure nanan tê xwarin. Seleteyên kurdî pirranî ji xiyar, bacanê sor, pîvaza heşîn, bexdenûs, kahû û biharbêhnan (biharat) e.



Wêne: Tendur û nanê tendurê û givriken hevîr.

Lê em dibinin xwarinê herêma Agiriye da ji ber şertû mercên iqlimê roj û seven sar zedetir cure cure şorbe tê çekirin. Bexew kirin û ditina me bidin ciheke din, mixabin nivîskarekî Kurd rewşa şorbeyan wiha aniniyê ser pênûsa xwe.

Di mehên çile de, xwarina nasdar û bi fêde şorbe ye. Dîroka şorbê bi qasî metbexa kurdî kevnare ye. Versiyona pêşî ya şorbê bi ihtîmalek mezin bi kelandina goşt û zêdemayîna "avgost"ê peyde bûye. Pêşxistin û peydekirina cureyên nû, bi perçe, hurik û zêdeyên ji ber xwarinê mane pêk hatine. Xwarina ji şîv an firavînê dimîne, bi formekî din, dibe şorbe û tê ser sifrê. Weke prensîp, xwarinên zêde bibin bingeh û bên bikaranîn jî, ev prensîp ji bo hin cure şorbeyan derbas nabe.³⁷

Di metbexa kurdî de şorbeyên nasdar ev in:

Avgost: Şorbemirîşk, şorbegoşt, serûpê/ kelepçe,

Şorbeyên taybet: Şorbenîsk, şorbenok (tirşik), şorbeşîr, şorbemast, şorbeşehîre

Şorbeyên heşinahîyê: Şorbekalem (lehane), girar, şorbespenaq, şorbekûmik,

Dema mirov şorbeyên kurdî ji nêz ve analîz dike, ji aliyê sûdên dighêjînin laşê mirov, tam û naveroka xwe têra xwe balkêş in. Taybetiyên şorbeyên kurdî, bi naverok û amadekirina xwe dikarin wisa bêne şirovekirin:

- Tevlîkirina tama tirşiyê esas e. Gelek caran tirşoyê şîn an yê kesidandî pê re tê ser sifrê. Tamdayîna tirşiyê bi lemon, avhinar an ava bacana tê kirin. Gelek caran pîvazên bi simaq şûna tirşoyê digre.

- Nanê teze pê re tê xwarin. Nanê kevin tê çandin.

- Bingeha şorbê bi giranî yek celeb tişt be jî, goşt an heşinahî lê tê zêdekirin. Goşt gelek caran amade ye. Parçeyên sorkirî, an kelandî ne. Goşt qasî liba nokê tê hurkirin, hinekî sorkirin, paşê heşinahî lê zêde dibe ku nirx û tamên xwe biparêzin. Bi lêzêdekirina avê û kelê bi dawî dibe. Şorbeya nîsk, nok û polke zû çênabin û kela zêde dixwazin. Lê şorbeyên bingeha xwe heşinahî ne, zûtir çêdibin û zêde nayên kelandin.

- Şorbê, xwarinek têr av e. Bingeh û giraniya şorbê çi tam dibe bila bibe, divê av lê zêde bibe. Şorbeyên xwezayî ku bi giranî tamed û rengê in, tenê av lê tê zêdekirin. Li gelek hêlên Kurdistanê tevlîkirina avgostê populer e. Avgost, tama wê xweştir dike. Her wisa ava bacana jî zêde tê karanîn. Ji bo hinek cure şorbeyan, şûna avê, mast an şîr dibin bingeh.

³⁷Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbîharê, Stênbol 2012, r.98

- Di metbexa kurdî de, tamdayîna sîr û pîvazê nasdar e. Xwarin û şorbeyên bê sîr û pîvaz kêr in.

Şorbeyên kurda, ne tenê çile, bi dewlemdiya şikil, tam û wîtamînên ji laşê mirovî re pêwîst, hemu demsalan tê xwarin. Ji bo siheta xwe, bi nanê kêr, ne tasekî, bê tirs du tasan bixwin. Noşîcan be.³⁸



Wêne: Dayîkê Kurd li ber çiyayê Agiriyê dew dikilîn e.

Li kû mijara me li ser edetên jibîrkirîne, hewceye kû em qala hevrîşk û sengesîrê jî bikin. Kebaniya zêdetir kû xwe da ser nanê amade, tendûr jî hêdî hêdî pevra hate jibîrkirin. Çimkî hevrîşk û sengesîr dema tendûra kesekî hebûya ew çağ dahate çikirin.

Dinav gel de xwarineke bi teybet bû. Literatûra gel da jî bi vê mînaka han va cih girtiye.

-Kebaniya malê bi îşk, mil vedide ta enîşk, nanê sêlê û nivîşk tevayî dike hevrîşk.

³⁸<http://www.tigrishaber.com/metbexa-kurdi-de-xwarinen-cile-741yy.htm> Gabar ÇIYAN

Hevrîşk:

Hevrîşk xwarineke ji nanê tendûrê yê n teze, germ û bi rûnê nivîşk ve tê çêkirin. Bi teybetî dema kû tendûra malekî hebûya, ew dem li ber serê tendûrê ew xwarin dahat çikirin. Nanê tendûrê yê n germ û teze hûrê firaqeke mazin dikirin, paşê rûnê nivîşk li ser dikirin û ewî rûn û nanî têr tê lihevexistin. Bi vî awayî ev xwarin ji boy servîsê amade dibe. Wek nanê genim, bi nanê ceh va jî te çikirin.

Sengesîr:

Sengesîr jî bi nanê tendûrê va tê çikirin. Mast tê sîrkirin û li ser nanê germ û hûrkirî va tê rêtin. Di dawiyê da rûnê nivîşk ê helandî ser wi nanê hûrkirî û mastê sîrkiri va tê rokirin. Wisa ew xwerek, ji boy xwarinê tê amade kirin.



Wêne: Sengesîr

1.11. Cınaqşikandin (Merc girtin).

Nav milete kurdan dabi taybet jî herêma Agiriyê da ji bo cınaqşikandin şert girtin, ketinabeşê, merc girtin, merc û peyman, 'şert û merchwd.³⁹ te gotin.

Cînaq: Cînaq hestiyekî mîna çetele dudiranî yê zû têşkandin. Dibe ku belîz (listikvan) şert digirin. Ew şertêwan jîli ser çibe dive were diyarkirin.

Mesela: Hesp û ziyafet û filan tişt. Û dilxwazjîdibun. Ev şerta jîwisan e ku di singê, wek kew û dîk û teyran de cınaq heye. Tînin ewî cınaqî du mirov dikeşin û dişkînin. Edî ew her du mirov her çi yek, mesela qelûne û yaxo fincana qawe û yaxo fekî û tişteki bidite deste merivê dine, gerek ew şert dayîm di bira wan da be. Ew mirovê ku mesela ewî tiştî dayiye distîne, de bibêje ku "min li bîr e." Eger ewî merivî şert ji bîr kirbe "min li bîre" negot, ew merive ku ewî tiştî didite deste wî, îcar ew mirov dibêje ku "yadest" Wekû ewî yadest got, ewi şert ji hevale xwe biriyê. Herçî şert e ew datînin kudi fikra hevalî da wekû ewi tişteki dayî e istandî, min li bîr edî bêje, tişteke tune. Ew şert her dimine heta ew herdu yek yekîbixapîne û ji bîra ye dine biçe û ji wî bibe. Wisamirovê bi bîr heyîn ku ew şert nêzkî saleke di nava wan da dimine. Ev şert zaf heyîn. Jin û keç digel yekûdu û digel meran bi şert dilîzin û ji yekûdu dibin. Ew jî dibe kudilxwaz şert digirin û ji yekûdu şerte distînin.⁴⁰

Le li ba kurdan jî edî ev kevneşopa zêde naye listik. Bi derketine televîzyone raûbi bajarbuyîne ra, wek gelek mîratên mirovatiye yên din, ev urf û 'edet jî hedî hedî ber bi bîrvakirine diçe.

1.12. Çerçîti

Karekî kû edî di nav gel de hatiye jibîrkirin jî çerçîti ye. Çerçî di nav gund û taxan de bi erebê destan va digerin û danûstanê dikin. Cîncik, benîşt, aman, firaq, derdan, pifdank (balon) hwd. ji xwe re difirotin. Mişteriye wan, ye herîn zêde, zarok û qîzên xama bu.

³⁹<http://legerin.ferheng.org/search/Antep/merc.html>

⁴⁰Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stênbol 2012, r.98



Wêne: Çerçî bi ereba desta ve...

Karên çerçîtiye de pere zêde girîng nebu. Danûstandin şûna pera, bi penêr, rûnê nivîşk (mala), hêk, hirî, genim û bi toraqê va dahat kirin. Zarokan hesin û eşyayê kevn didane çerçîya û pêş ve ji xwe re benîşt, pifdank, fiştoq hwd. distandin.

Hin caran bi erebê hespan ve zebeş, qire, pîvaz, kartol, firingî, tirî danîn difirotin. Zozan an jî gundan de li cihkî sabît disenîn, jin, zar û mir dahatin ser çerçî û alvêra xwe dikirin. Deyn tine bu. Hemî kurrîn û firotin pêşin dahat kirin. Me di serî da jî got, pere girîng nebu li pêşve, malên xwe bi hev re vediguhistin.



Wêne: Çerçî bi ereba hespan ve danûstanê dike.

Li îro bi zêdaya wasayîtan va gundî êdî danûstanên xwe li navçeyan an jî bajara dikin. Di nav gundan de dîkan ji xwe re vekirin e. Kirrîn û firitanê xwe li wan dîkanan dikin. Vegguhistin jî êdî di nav gel da rabu. Penêr, toraq, ceh û genimê xwe bi pera difiroşin û bi wî pereyî diçin danûstanê xwe dikin.

1.13. Paletî

Karên xebata li nav erdan û çinînêre têgotin. Ji kesên wî karî dike re jî dibêjin pale. Berê hemî karên paletiyê bi qeweta insanen û bi amurên desta ve dahat kirin. Tirpan, şene, tirmix, banukî hwd. Dema çinînê ku dahat, xwedî zevî u mîrgan çend roj pêş de palê xwe digirtin. Roja çinînê, pale berî berbanga sibê li cihê dahatin cem hev, peya u bi wasayîteke wek dîretor siyar dibun diçun ser karê xwe.

Piştî xurînî (xwerina berî taştê) dest bi çinînê dikirin. Peşiyê, tirpankêşa dest bi karen dirune (çinîn) dikin. Gava dirun te kirin tirpankêşê herî bi hêz peşiya hemî tirpanan e. Ji boy ku kare çinîne zêde were kirin. Ew kesê ku di paletiyê de serê ber dikişîne ji re dibêjin honaz. Honaz çikasî jêhatî be kar ev kasî zêde dibe. Cixareya en rind kijan bu ew cixare ji Honaz re distandin. Peyra ew kesên ku tirmixê dikin wan gîha an jî simbilan topî ser hev dikin. Ji wan gîha an jî simbilên komkirî re jî dibêjin lûs. Dema xebatê da di nav paleyan de kilam tê gotin, laqirdî tê kirin u wisa dema xwe diborandin. Xwarin-vexwarin kîsê xweyî milk bu. Piştî hemî xwarinan tirpankêşan tirpanên xwe bi çakûç u sindana ve dikutan, devê tirpanên xwe tûj dikirin.

Çendek piştî dirune, hemî çinînên di nav zevî u mirgan de dikişînin ser bider u merkan. Gîhayê xwe cihê nêzikî dirungê xwe dikin lod. Gunda de jî lodê xwe li berhev datînin, ji boy ewletî ye.



Wêne: Tirpankêş tirpana xwe tûj dike.

Genim an jî cehê xwe li ser bideran dikirin gêle an jî partosê dixistin. Ev kar carinan deh panzdeh roja zêdetir dewam dikir. Genim, ceh ji simbilan diqetandin. Sapên mayî dikirin ka (pûş) ji boy debara heywanan.

Jin u mir wek hev dixebitîn. Jinan ew genim dişuşt, ziwa dikir u datinîn têran de. Piştî zikat dayîna ceh u genimê xwe, miran toximê xwe ji wî ceh u genimî hildida. Ew toxim di çel(embar) u têrada dida ser hev ji boy saleke din. Yên mayî jî, tira xwe u malbata xwe, dibire aş u dihira, zexîra xwe ji digirt. Herge ku zêde bima ew jî difirotin.



Wêne: Pale nan didine patos e.

Lê di roja îro de ev diştên kume li jor behs kirin êdî nema ye. Şuna palyan an jî amurên berê, biçer (makîneya dirûnê), makîne yên modern girtin. Hemî karên ajaldariye êdî bi makîne yên modern tê kirin. Gêle an jî berbakirin hatiye jibîrkirin.



Wêne: Cotkarîya modern.

Ked u karên ku hatiye jibîrkinin bereket u tehm a mehsûl jî bi xwe re da birkinin. Tirpan, şene, tirmix, banûkî hwd. Di ber arîkê gom u xaniya de wek dîrokeke ne nivîs sekinîye...

1.14. Porkurî:

Nîşana belayê û cezaya qebebetê ye. Bêçaretî ye, li ber belayekegiran tiştê ji destê ewên ku bela bi serde hatine nayê û bi tenê ji wê kerbê porênxwe kur dikin. Bi taybet ev tiştê ji aliyên jinan ve tîn kirin an jî ev tiştê li serjênan tîn kirin. Porkurî ji namûsê tîn. Gava di zewacê de keç 'ne qîz be' porê wê tîn kirin û bi ser mala bavê wê de tîn şandin. Porkurî ji vê edetê derketiye. Demakû belayek bi ser lehangên çîrokê de tîn, dayik an jî xwişkên wana porên xwe kurdikin, ev jî nîşana belayê ye.

Di dîrok û çanda Kurdan de kezî tiştêkî gelekî pîroze, dema ku keçek ciwan keziyên xwe birî tîn wateya ku êdî tu hewesa wî ya jiyanê nemaye.

Mirov dikare bêje çandên gelan her ku diçe dibin desthilatdariya kapîtalizmê de winda dibin. Ji bo wê jî mirov dikare bêje îro qîmetê keziyan jî di nava gelê Kurd de kêmbûye an jî nema ye. Lê wek nifira dinav gelda tîn bikaranîn. 'Pore te kurkim, porkurê, porê xwe ser bavê xwe da kurkî û hwd.' Zêdetir çanda kurdê êzîdî da ew kirin bûye edet...



Wêne: Keziyên birî li ser kêlikan.

2. YÊN NÛJENBÛYÎ

Di berê da heta îro nav Kurdan hinek urf û 'edet hene bingehiya çand û kelepura Kurdan çedikin. Lê di nav herikandina sed salan da xwe mihefeze dikin feqet ji berşert û mercen dinyayê tèn guhertin û nûjen bûyî. Li vê dere em hinek minakan bidin.

2.1. Sinet û Kirîvatî (Sunneta Nebî)

Sinnet wek nave xwe karekî olî ye. Dema hezretî Îbrahim heta iro ev rituela olî devam dike. Ji bilî mislimana, di olen cuda de jî ev ev çalakî te xuya. Li bele edeten rituele sinnetan gorî ol u milettan ji hev cudatir e. Li ba Kurda ev kevneşopîya olî ç a te kirin em biniheren...

Xweyiye kure sinnetkirin de tedarika zad û teame (xwarin û xureke) dikitin. Wekî roje de ew zarokbene birrîn (werinsinnetkirin), xelqe gazî dikin û kirîv jî ten. Xêr û xêrat pê sinetê tê kirin û demên bere piraniya we mewlûd dihate dayin û devşirinî belav dibû. Mewlûd, nav kurdanda pir girînge. Paşî te'ame, xelq belav dibin. îcar dellak ten, ewan zarokan dibirritin. Lakın bexşîşa (bexşîş) dellakî û xelata wi ê ku bûyi kiriwa (kirîv), ew mirov didin. Ê heta se rojan, roje du danan xonçe (sifra xwerine) û zad ji mala kirîwan ji boy wan zarokan te. Wekû ew zarok rabûn, ew kiriwa ji boy her yekî anegora hale xwe destekî libasî (cil û berg) dikitin û dike ber wan. Paşî çend rojekan edî bave zarokan ewî kirîwî mêr û jin gazî mala xwe ziyafete dikin. Ê paşe mer û jine kiriwan anegora hale xwe xelat didine û biredikin.⁴¹

Li îro em dibînin ku sinnetnebî edî wek daweta te kirin. Salonek te deman kirin. Xweyiye kure çend roj peş de gazi mêvanên xwe dike, amadahiya xwe diqedîne. Sunneta kure xwe li ba kirîv nake. Şuna ve yeke, peş de di nexweşxaneki de cem nijdar sinneta kur u kuren xwe dide qedandin. Du re roja dawet e sinnete mêvan topî salone dibin, bi xwendine mewlude re xelat tene avîten. Paşe mivan xurek dixwen u belav dibin. Akriba ye nez piştî nan xwarine zu bela nabin. Govende digêrînin, şahiya xwe dikin u sinnetnebî ya xwe wisa diqedînin.

Dawîye de em dikarin bibejin ku dema naha de dawet ve sinnetnebî bi awayê çêkirinê ve wek hev bune.

⁴¹Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stênbol 2012, r.98;



Wêne: Sinnetnebi li ba dellak. Wêne: Sinnetnebi li ba nijdar

2.2. Serxweşî

Serxweşî an sersaxî, karê çûna mala yê mirî ye. Pir kes hene ku cudatîyekê naxin navbera "serxweşî" û "sersaxî"yê. Ev bêje, ji bêjeya "ser" û "xweş"ê hatiye holê.

Serxweşî çandeka kevnare ye ku nav gelê kurd da wek sersaxî û dilgirtin û pişgirî tê qebl kirin. Dema ku mirîk dimire gel, gundî nav hevda dicivin ji bo serxweşiyê diçine mala mirî. Li gor mezinahî û qimetê wî kesî/ê carna taziye dirêj dibe. Ji bo serxweşiyê hemû eqraba û heval û hogirên mirî dest bi karên xwe berdidin heft rojan taziye digirin. Dema taziye da ji bo jinan ji cihekî taybet tê amadekirine.

Serxweşiyê da bahsa qencî û pakîyên mirî tê kirin ji bo wî xelalî tê xwestin û şîret û meselên olî tî axaftin. Her roj xwarina mirî wek xêr tê belavkirin dia û rehma Xwedê tê xwestin. Ji bo ruhê mirî Quran a pîroz wek fetiha, yasîn û xitim tê xwendin.⁴²

2.3. Deng û Dengbêjî

Dengbêjî, kevneşopîyeke gelekî girîng ji bo çanda kurd e û ji hunera xwendina kilamên gel ên kurd re tê gotin. Li dîrokê da kurd tim mecbûr man ku çanda xwe bi "deng" yan jî "gotinan" bi cîh bînin. Kurd li her demê li welatê xwe da hatine bindest kirin û mîna

⁴²Mela Mehmudê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Lêkolîn: Jan Dost), Weşanên Nûbiharê, Stênbol 2012, r.98

ecnebî hatine xwuya kirin. Ji ber vî yekê "nivîs" û "pirtûk" li nav kurdan da zaf kême û hîna îro jî pirr kurd nivîs û xwendinê nizanin.

Meriv kare dengbêjan bike du bes: *çirokbêj* bi giranî çirokan dibêjin û beytbêj jî helbestan dixwîne. Herwiha, li Kurdistana rojhilat ji dengbêjan re lavjebêj tê gotin û cend dengbêjênherî nas ji Qafqasyayê (Ermenistanê) ne. Carina dengbêj kilam û cîrokên xwe bi alîkariya dîdûk/qernetê, tembûr û enstrumanên din didin xwandin.⁴³

Li hêla din da çand û zimanê kurdî di hêla dengbêjiyê da, yanê di hêla gotin, kilam, stran û çirokan da pirr dewlemend bûye. Zimanê kurdî bi gotinên dengbêjên hêja hettanî roja îro hatîye û wunda nebîye. Gava ku em îro hîna kurdî qise dikin, va kerrî pirrî ji saya dengbêjan e.

Di dema me ya îro de dengbêjan li hemberî hemû astengî û hewldanên asîmîlasyonê di parastina çanda xwe de biserketine û beşeke girîng a muzîk û çanda kurdî gihandine dema me. Bi saya wan e kilamên dengbêjiyê- hê jî - wek dîrokek zindî - rastî ecibandina guhdarvanan tîn.Lêêdî wek bere dengbej nav Kurdan de pir nemaye. Ku wiha dewam bike dengbêj u dengbêjiye bibe wek çîrokekî.

Li welatê kurdan, her herêmek bi taybetîyên xwe va derketîye pêş. Taybetmendiyên herêma Serhedê jî dengbêjî û dengbêjên wê ne. Di nava Serhedê jî cîyê herî zêde dengbêj derxistîye, bajarê dengbêjê kor, bajarê Evdalê Zeynikê, Gula Fille, Mistefayê Çiftborî û Şakiro, bajarê Agirî ye. Yek ji wan dengbêjên ku ji wî bajarî, mijara vê vîdyoya me, Ahmedê Hêlikan, bi navê xwe yê din Ahmedê Agirîyê ye.⁴⁴⁴⁵

Dengbêj, dîroka kurda da gelek gîrînge ew qas jî watedar û kevnare. her dengbêj bixwe gotinên pêşîyan bidevkî ye. Mîrov bi awayê muzîkal derdê xwe dibêje tiştekî em tewra dengbêj bikartînin ew jî dengbêjî dibe

⁴³**ETHEM ZORBEG AXA**, *Devera Serhedê*, Gihadîn-Agirî 1953, Ragihandin: 21 Tîrmeh 2017.

⁴⁴<https://www.youtube.com/watch?v=SrRPLXtOZrs>

Mela Mehmûdê Bazîdî, derbarê rûdanên derdor qewimî û honandina wan a ji aliyê dengbêjan ve di kitêba xwe ya bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* de gelek nimûneyan pêşkêş dîke bo xwendavanan. Bo agahiyên bêhtir bnr, Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amadekar, Ziya Avci, Weş. Lîs, 2010, Diyarbakır, r.127

⁴⁵Day Felek Yıldız Ü Malbata Wê,*Devera Serhedê*, Gihadîn- Agirî 1945. Ragihandin: 11 Adar 2017

Dîroka me ya kurdan de cihê dengbêj û çîrokbêjan pir girînge. Dema radyo û televîzyon tunebûn, jiyana kurdan, dengbêj û çîrokbêjan dianîn ziman, ew şevên dirêj her şevêkî li malekî de hev dicivayan û bi zimanekî qedexe bi şêwazeke hûnerî ku bûyerên li ser kurdan re derbas bibûn. Awayekî dengbêjî dilorandin, ewr û ezman jî li peyvên dengbêjan re hevaltî dikirin.

Dengbêjan li ser her mijarê diavêtin li ber hev, tizbiya destê çîrokbêjan de jî mîna tembûrekî lib lib li bin ronahiya çira qayzaxê de dihat kişandin. Oda ku li hev dicivayan li heta ber derî tijî dibû, zarok jî paşika dapîr û bapîrên xwe de cih digirtin, bûk û xulamên malên jî li pişt derê odê de bi dilekî şermoke li kilam û çîrok guhdar dikirin. Dîroka kurdan de kilam û çîrok pir watedarin. kurd li ser axa xwe mîna gulên biharê cûr be cûr dengbêj û çîrokbêjan diafirînin, her dengbêjek xwedî xweşêwazekî bû, dema çîrokbêjan çîroka Siyabed û Xecê li civata xwe re dianîn ziman, ew keç û xortên wî gundî hin caran kelogirî dibûn û xwedî hestên xwe nikaribûn derketina, ji ber ku evîna Siyabend û Xecê pir bandor li ser wan civatê dikir.

Dema em zarok bûn çîroka Evdalê Zeynikê jî her şev dê û bavê me ji me re digotin, kesê ku çîroka Evdalê Zeynikê nizanibû pir kêmbû. 7 salî bigre heya 70 salî her kesî ew çîrok jiber zanibû. Piranî jiyana kurdan li ser gotinên çîrokbêj û dengbêjan xwe dida nîşan, gava ew gundê li dengbêj tê de tunebû ew gund hatibû bîrkirin, ji ber ku dengbêj neynika çand û hunera kurdan e.

Dema bihar dihat dawet derdiketin holê, ji bo wê jî dengbêjan hêdî hêdî şêwazên xwe diguhirandin û dest bi kilamên daweta dikirin, yek sergovend ên din jî dawiya govendê digirt û stran diavêtin li ber hev, keç û xort bi gotinên dengbêjan govend coş dikirin. Girêdayî demê naveroka çîrok û kilaman jî bi dilekî xemgînî hate guhirandin, êdî dengbêj û çîrokbêjan bala xwe dan zilma li ser kurdan tê kirin.

Dengbêj û çîrokbêj li ser wan bûyerên ku dîroka kurdan de qewimîne diketin nav hewldanekî, bar kete li ser pişt wan, li her peyvekî de xwîn diherikî, dengbêjên serhedê dengbêj Şakiro mînak e. Li herêma Serhedê de kilamên ku anîne ziman naveroka xwe têr û tijî mîna pirtûkekî ber bi çave. Xwesteka min ew e ku her kurdek dengbêjên mîna Şakiro guhdar bike ku xwe tê de bibîne.⁴⁶

2.4. Mezhebê Kurdan

Li ba mislimanên Sunnî, çar mezheb hene; Şafiî, Henefî, Malikî û Hembelî. Her mezhebek li ser nave danerê wî hatiye binavkirin.

⁴⁶<http://www.haberercis.com/canda-kurdan-de-dengbj-makale,157>. Salih MARUFOĞLU.html

Ekrad herçî heyîn rewend û xwecihî, hemû jî şafî el mezheb in (şafî ne). Mezhebi henefînezîkî neteweyên Erebiyê û mezhebe dewleta Osmanî bu, dibe ku ev yek jî ne ji valatî hatibe, Kurdan mezhebe dewlete qebul nekirine. Ji ber ve yekedi nava Kurdan datû ferdek (yek kes, takekesek) henefî, malîkî û henbelî tu niyê.

Lê belê dema iro em dibînin ku gelek Kurd ser mezhebe Henefî ibadete xwe tîne cih. Bi teybetî neslen nu mehra xwe ser mezhebi Henefî dibirin û jiyana xwe wisa didomînin. Guherînen çandî jî ve yeke bandor dike. Xebata jina ya nav civake de re dide ve guherîne. Alîkîva jî ciwanen dergistî jî bo rihetîya xwe ve tercîhe dikin. Bi teybetî jî ji bo betalbuna destnîmeje mezhebe Henefî dinav gel de tê pejirandin.

Em dikarin bibêjin ku bi giştî Kurd Şafî bin jî, kismekî pir zêde edî li ser mezhebi Henefî ye. Li gorî Mele Mahmudê Bazîdî sedsala 19 an da hemû Kurd mezhebê Şafîi takîp dikirin.

2.5. Eşîr û Paşnav

